# BILA 2017 BIBE SALA AZADIYA ABDULLAH OCALAN



## Jinan ji bo azadiya Ocalan banga têkoşînê kir

### BI MEHAN E HEVDÎTIN NAYÊ KIRIN

*TECRÎDA LI SER* Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku gelê kurd gelekî diêşîne, 18 sal e bê navber tê meşandin ji salekê zêdetir e tu hevdîtin bi Ocalan re nayên kirin. Jinên wanî aşkera kir ku ew di sala nû de dixwazin Rêbertiya wan azad bibe û bang hat kirin ku ji bo azadiyê tê bikoşin.

### AZADIYA OCALAN AZADIYA JINAN E

*HEVSEROKA* HDP'ê ya Artemêtê Edîbe Babur diyar kir ku jinan li dijî êrîşan tu car ji azadiya xwe tawîz nedaye û wiha axivî: "Sala 2016'an sala têkoşîna jinan bû. Lê divê ji bîr nekin ku azadiya jinan girêdayî azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e û divê li gorî vê têkoşin bê dayîn... R/2

ROJEVA Medya

1 Çile Yekşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 52

## LI EGEYÊ 68 JIN HATIN QETILKIRIN



Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) bi raporekê aşkera kir ku di sala 2016'an de tenê li herêma Egeyê 68 jin ji hêla mêran ve hatine qetilkirin, bi dehan bûyerên tacîzê, îstîsmar û şîdetê qewimîne... R2

# XELATA SERSALÊ!

**Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Akademiya Ehmedê Xanî, Roboskî-Der jî di nav de deriyên 94 komeleyan bi awayekî korsanwarî û dijhiqûqî hatin mohrkirin. Li Tirkiye û Kurdistanê hemû saziyên ku li ser zimanê kurdî dixebitin yek bi yek hatin girtin**




Wezareta Karên Hundir a tirk di çarçoveya Biryarên di Hikmê Qanûnê de (KHK) deriyê 94 komeleyên din jî mohr kir. Di nav wan komeleyan de Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî heye.


Enstîtuya Kurdî ji aliyê rewşenbîrên kurd Mûsa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç, Îsmaîl Beşîkçî, Abdurrahman Durre, Îbrahim Gurbuz û hwd. ve di 18'ê nîsana 1992'yan de hatibû avakirin.

Hevserokê Enstîtuya Kurdî Samî Tan anî ziman ku 20 sal in enstîtu li ser zimanê kurdî xebatên lêkolîn û akademîk dike û ji sala 2006'an vir ve wek komele xebatên xwe didomandin.

Tan da zanîn ku enstîtu bi awayekî korsan hatiye girtin û wiha got: "Heta zimanê kurdî û têkoşerên zimanê kurdî hebin em ê xebatên xwe bidomînin. Ev qad dê vala neyê hiştin."

### Li Wanê 27 komele hatin girtin

Faşîzma AKP'ê ya li dijî saziyên civakî sînoran nas nake. Li Wanê 27 saziyên civakî ku NÇM û meclisên taxan jî di nav de ne ji hêla Wezareta Karên Hundir ve hatin girtin... R/6



## Dewlet çi ji rûspiyan dixwaze!

Dewleta tirk bi salan e li dijî rûspiyên kurdan êrîşeke li dijî exlaq pêk tîne. Herî dawî vê êrîşê bi girtina siyasetmedarê kurd Ahmet Turk berdewam kir. Piştî ku Turk xistin girtîgehê, ji ber şert û mercên girtîgehê her roj tenduristiya wî xirabtir dibe... RÛPEL - 6




## Biraziyê wî bû gerînendeyê çandê

Piştî qeyûm tayînê şaredariyên Amedê hat kirin, hat gotin ku hemû dizî û îhale ji hêla wekîlê AKP'î Galîp Ensarîoglu ve tê kirin. Derket holê ku biraziyê Ensarîoglu, Fethî Ensarîoglu jî tayînî Gerînendetiya Park û Baxçeyan a Şaredariya Peyasê hatiye kirin. ... RÛPEL -6



## Dê ev herikandin raneweste


Rojnamegerên kurd Heqî Boltan, M. Alî Ertaş û Îbrahîm Aslan destnîşan kir ku hikumeta AKP/Qesrê bi rewşa awarte re li dijî hêzên demokrasiyê pêla faşîzmê daye destpêkirin û got ku dê çapemeniya azad wekî çemekî biherike... RÛPEL - 6

JI PARTIYÊN KURD PEYAMÊN SERSALÊ

## Bi hêviya yekitiya neteweyî

**Gelek partî û rêxistinên kurdistanî peyamên sersalê weşandin û diyar kir ku dê di sala nû de bi her awayî berxwedan bê bilindkirin**

Rêxistinên kurdistanî yên wekî KCK, KJK, KCD, KNK, TEV-DEM, HDP, DBP û gelek rêxistinên din peyamên sersalê weşandin. Di peyama KCD'ê de hat gotin ku ew hêvî dikin ku di sala nû de kongreya neteweyî pêk bê û ji gelên Kurdistanê re serkeftin hat xwestin... R/2/6/7





## 2017 do bibo serra azadîye

Şerwanê YBŞ û YJŞ Şoreş Şengal, Roza Raperîne û Şoreş Fedakarî derheqê serra neweyî de qisey kerdî û wina vatî: "Serra 2017 do bibo serra azadîya Rayberê Şarê Kurdî, Şengal û Rojhelato Mîyanênî." ... RÛPEL - 11

## Hûmara 50. ya Vateyî vejîya

Kovara Vateyî ke serra 1997î ra nata bi hawayo nîzamin vejîyena, nika zî hûmara 50. ya kovara Vateyî vejîya. Sey her hûmare muhteweya na hûmara kovara Vateyî zî bi roportaj, nuşte, şiîr û sewbîna pirr o. Na hûmare de roportajêk serredaktoranê kovare ra J. Îhsan Esparî reyde û roportajêk zî şaîrê namdarî Silo Qizî reyde ameyo viraştiş, ca gêno. RÛPEL - 11




www.arsivakurdi.org

## Wargeh e yan medrese ye?

**PIRSGIRÊKÊN XWENDEKARÊN JIN** ên li Amedê dixwînin, her ku diçe zêdetir dibin. Xwendekarên jin ên li Wargeha Ziya Gokalp a KYK'ê dimînin diyar kir ku 'mirov nizanin ev wargeh e yan medrese ye?.' û bertek nîşan dan. Xwendekar C. anî ziman ku ji ber wargeha ku lê dimînin hatine asta ku dibistanê berdin û wiha got: "Em êdî bêzar bûne ku giliyên xwe bînin ziman. Her roj bûyerek pêk tê. Hemû jin tên tirsandin." C. got ku wargeh ji KYK'ê derketiye û wiha axivî: "Li her derê ayet hene. Li her derê nivîsê olî û wêne hene. Her sibeh saet 5'an de jinan hişyar dikin û dibên nimêj. 'Xwişkên manewî' li her derê digerin. Me hişyar dikin her sibeh. Her wiha sohbetên olî tên kirin." **AMED - ŞÛJIN**





# 2017 dê bibe sala azadiya Ocalan û bihara jinan

**KJK'ê der barê sala nû de daxuyanî da û diyar kir bi avakirina eniya berxwedanê ya hevpar dikare pêşiya êrîşan bê girtin û bi vî awayî sala nû bibe sala bihara jinan û azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan**

Komelên Jinên Kurdistanê (KJK) der barê sala nû de peyamek nivîskî weşand. KJK'ê diyar kir ku sala 2016'an hem ji bo jinan hem jî ji bo hêzên demokrat û muxalîf bûye sala têkoşîneke xurt. KJK'ê destnîşan kir ku di sala 2016'an de qirkirina jinan li Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê zêde bû, li hemberî wê jî jinan berxwedaneke mezin nîşan da û wiha hat gotin: "Di şexsê Pakîze, Fatma, Asya û Dayika Taybet de, ku ji bo siberoja azad gelê me û jinan bi lehengî şehîd bûn, di şexsê pêşengên me yên gel û hevrê Berfîn, Axîn, Bengî, Gulan û Serhildan de hemû şehîdên xwe yên bûne abîdeya berxwedana şoreşgerî bi rêzdarî bi bîr tînin. Em soz didin ku berxwedana wan a destanî ya li ser navê hemû jinan meşandine, li ser bingeha avakirina jiyana azad em ê bê teredût bidomînin."

KJK'ê da zanîn ku bi pêşengiya Erdogan û dewleta AKP'ê ji hemû serdeman girantir êrîşên hovane pêk hatine ew jî Erdogan ji bo desthilatdariya xwe mayîde bike, kirine. KJK'ê her wiha got ku tecrîdeke girankirî li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin û ev tişt ragihand: "Di sala 2017'an de li dijî van êrîşên faşîst, divê wek jin û gel em li dora Rêbertiyê xeleka berxwedanê ava bikin û azadiyê mîsoger bikin. Ji ber vê yekê divê em di sala 2017'an de wek jin û gel birêxistinbûna xwe, yekitiya xwe ya neteweyî û berxwedana xwe mezintir û radîkaltir bikin." KJA got ku bi avakirina eniya berxwedanê ya hevpar dikare pêşiya êrîşan bê girtin û bi vî awayî sala 2017'an dikare bibe bihara jinan.


KJK'ê sala nû li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, hemû bindestan, jinan, kedkar û gelan pîroz kir û wiha got: "Em 2017'an bikin sala hevgirtina jinan, birêxistinbûnê, berxwedanê û destkeftiyên mezintirîn. Em sersala Rêber Apo ku bi berxwedana xwe ya mezin û kesayetiya xwe ya azad, berxwedana jiyan û têkoşînê diyarî me kiriye, sersala hemû hevrêyên xwe yên ku bi lehengî li ber xwe didin bi hezkirin û bêrîkirinê pîroz dikin. Siberoja azad dê ya berxwedêrên birêxistinbûyî û têkoşerên biryardar be." ***BEHDÎNAN - ANF***

## Kujer tên xelatkirin

Li navçeya Kaniya Xezalan a Rihayê di cokeke avê de cenazeyê jinekê hat dîtin. Cenazeyê ku ji aliyê kedkarên li coka avê dixebitîn ve hat dîtin, lê nasnameya wê nehat dîtin. Cenazeyê ku hat aşkerakirin aîdê jinekê ye û serê wê birîne, ji bo otopsiyê rakirin morga tipa edlî. Kuştin, taciz, tecawiz, lêdan, kuştina bigûman her ku diçe zêdetir dibe. Ev jî bingeha xwe ji polîtîkayên şer û ji zîhniyeta feodal û polîtîkayên ku jinan dikin hedef, digire. Her roj jin tên qetilkirin, ev cîhan bûye cîhana komkujiyan. Li vî welatî zilamên kujer, tecawiz, tacîz û lêdanê li ser jinan pêk tînin û her roj gulekê ji jiyanê qut dikin, nayên cezakirin, tên xelatkirin, loma ev bûyer jî zêde dibin. **RIHA**

# 2016 bû sala qirkirinê

Komîsyona Jinan a Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Îzmîrê li avahiya komeleyê rapora binpêkirinên mafên jinan a 2016'an aşkera kir. Endama Komîsyona Jinan a ÎHD'ê Mîne Çetînkaya diyar kir ku di 2016'an de bîlançoya şîdetê ya herêma Egeyê giran e.



Çetînkaya destnîşan kir ku li herêma Egeyê 68 jin rastî îstîsmar û êrîşa zayendî, 48 jin hatine qetilkirin, 48 zarok rastî îstîsmara zayendî hatine, 2 jin rastî tehdîdê hatine û zarokek jî hatiye kuştin. Çetînkaya got ku zimanê desthilatdariya siyasî û çapemeniya zayendperest şîdeta li hemberî jinan zêde kiriye û wekî ku normal nîşan daye. Çetînkaya destnîşan kir ku ji ber ku kujer bê ceza dimînin şîdeta li hemberî jinan zêde dibe. Çetînkaya anî ziman ku bi biryaya KHK'ê û bi OHAL'ê re 370 rêxistinên civakî û got ku bi girtina komeleyan birêxistinbûn û têkoşîna jinan hat hedefgirtin. Çetînkaya anî ziman ku dê têkoşîna wan li hemberî şîdet, kuştin, taciz û tecawizan bidome. ***ÎZMÎR -ŞÛJIN***

## Ev sal jî dê bibe sala têkoşîna jinan

**SALA 2016'AN** ya ku êrîşên li dijî jinan di asta herî jor de pêk hatin em li pey xwe dihêlin û jinan ji bo sala nû dîsa got 'aştî.' Jinên Wanê li dijî êrîşên li hemberî jinan banga parastina cewherî kir. Hevseroka DBP'a Erdîşê Hatîce Yildiz diyar kir ku gelê kurd ev 30 sal zêde ye têkoşîneke mezin dimeşîne û got ku ew tu car bêzar nebûn. Yildiz got ku dê sala 2017'an bibe sala jinan.

Hevseroka HDP'a Artemêtê Edîbe Babur jî destnîşan kir ku jinan li dijî êrîşan tu carî ji azadiya xwe tawîz nedaye û wiha axivî: "Sala 2016'an sala têkoşîna jinan bû. Em bûn şahidê têkoşîna jinan a li Kobanê, Cizîr û Şengalê. Azadiya jinan girêdayî Azadiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan e û em dixwazin birêz Ocalan azad bibe." Rêvebera HDP'a Wanê Leyla Işik jî da zanîn ku sala 2016'an ji bo wan jinan pir bi êş bû û ev tişt anî ziman: "Em jin bi salan e li her derê dixebitin. Tu sal wek 2016'an derbas nebû. Li Kurdistanê li her derê têkoşîna jinan hebû. Jinan roleke sereke di têkoşînê de lîst. Me berxwedana jinan a bêhempa li Sûr, Nisêbîn û Cizîrê dît. Ev ji bo me mîladek bû. Bila sala 2017'an jî bibe sala azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan." **WAN - ŞÛJIN**

## Binpêkirina mafan derketiye asta herî jor

**Piştî OHAL'ê binpêkirinên mafan jî zêde bûn. Parêzer Hatîce Demîr diyar kir ku li girtîgehan û di pêvajoya binçavkirinê de zext û binpêkirin tên jiyîn û got ku ev di hiqûqa navneteweyî de sûc tê hesibandin. Demîr anî ziman ku li Kurdistanê ji ber pevçûn û qedexeyan di binçavan û girtîgehan de jî binpêkirinên mafan derketina asta herî jor û wiha got: "Bi OHAL'ê re ev sînor derbaskiriye. Li van deran lêgerîna tazî tê ferzkirin û jinên vê qebûl nakin jî rastî îşkenceyê tên. Tenê bi îşkenceyê sînor namînin û heta tecawizê jî diçe. Bi taybet li ser bedena jinan pir zêde îşkence tê kirin. Hem şîdeta fîzîkî, hem ya psîkolojîk tê kirin." Demîr destnîşan kir ku fabrîka, dibistan, kişla, nexweşxane û girtîgeh hemû yek bi yek amûrên desthilatdariyê ne û wiha axivî: "Bêguman li cihê ku dehilatdarî hebe destpotî jî heye. Pirsgirêkên girtîgehan ên salên 80-90'î ji nû ve tên jiyîn. Hevdîtinên bi malbatan re tên astengkirin, hewcedariyên girtiyan nadinê, xwarinên xirab didinê û ava germ tune ye. Pêkanînên li girtîgehê di rojevê de baş cih nagirin." AMED - ŞÛJIN**







***Wêneyên ku mohra xwe li 2016'an da***

Di nava bi dehan wêneyên ku mohra xwe li sala 2016'an da, 2 ji wan wêneyan jî li Rojava hatine kişandin. Ev her du wêne di dema azadkirina Minbicê de hatine kişandin û bandoreke mezin li ser civakê çêkiribû. Yek wêne dema şervanên jin Minbic ji çeteyên DAIŞ'ê azad kir ku çarşefa reş ji ser xwe diavêje û wateya azadiyê vedibêje û ya duyemîn jî şervanên YPJ'ê dema ji bo azadiyê kêfxweş dibin. **AMED**

# Ji bo sala nû projeyên girîng hene

Desteya Jinan a Efrînê di sala 2016'an de gelek projeyên girîng û serkeftî wekî 'Kooperatîfa firotina madeyên xwarinê û kargeha berhemên şîr a Bêrîvan' pêk anî. Desteyê bi van projeyan sala 2016'an bi dawî kir û ji bo sala nû jî projeyên girîng hene ku bikevin meriyetê bi armanca bîranînên têkoşîn û berxwedana jinan di şoreşa Rojava de, dê peykerekî "Jina Têkoşer" li navenda bajarê Efrînê bê çêkirin û di roja 8'ê Adarê de bê danîn. Li ser projeyên desteyê yên pêşerojê, Cîgira Desteya Jinan a Efrînê Dilîşan Mihemed axivî û diyar kir ku îsal projeyên wan ên aborî, civakî û perwerdeyê hene û ji bo vê yekê koordînasyoneke baş hatiye amadekirin.

Dilîşan Mihemed da zanîn ku ew vekirina akademiyeke xweser ji bo perwerdekirina jinan dikin, her wiha anî ziman ku dê Buroya Şêwirmendiyên Dadî, Civakî û Aborî jî bêne vekirin. Dilîşan Mihemed got ku dê bi hemû derfetên xwe alîkariya jinan bikin û bang li hemû jinan kir ku ew jî bi awayekî komunal bixebitin. **EFRÎN - AHNA**

www.arsivakurdi.org

# Sal diçin lê têkoşîna wan mezin dibe

**Dayikên Şemiyê û xizmên windayan ên li Stenbol û Amedê ji bo sala 2016'an wiha got: "Tu çûyî, careke din venegere." Dayikan diyar kir ku dê di sala 2017'an de jî têkoşîna xwe berdewam bikin**



Dayikên Şemiyê di hefteya 614'an de dîsa li Qada Galatasarayê kom bûn û çalakiya "Faîl diyar in, winda li ku ne" berdewam kirin. Dayikan di çalakiya xwe de çarikên spî ku remza aştiyê ne û qurnefîlên sor danîn ser wêneyan û pankarta "Faîl diyar in winda li ku ne" vekir. Dîsa dowîzên ku wêneyên windayan lê ne, rakirin.

Di çalakiyê de Serokwekîla Koma Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Filiz Kerestecioglu û nivîskar Necmiye Alpay a di 30'ê kanûnê de serbest hat berdan, parlamenterê CHP'ê Sezgin Tanrikulu û gelek kesên din amade bûn. Dayikên Şemiyê di çalakiyê de dayika Fatma Morsumbul bi bîr anî û ji bo sala 2016'an got "Tu çû, careke din venegere". Dayikan diyar kir ku dê di sala 2017'an de jî têkoşîna xwe berdewam bikin. Parlamenterê CHP'ê Sezgin Tanrıkulu jî diyar kir ku dayik zarokên xwe nabînin û diçin û wiha got: "Di sala 2016'an de gelek kes hatin kuştin. Em hêvî dikin ku sala 2017'an mirin çênebin. Nalet li vê dîroka ku mirin tê de hebe, bê." Parlamentera HDP'ê ya Stenbolê û Serokwekîla Koma HDP'ê Filiz Kerestecioglu gotina dayikan a "Dengê me nabihîzin" bi bîr xist û wiha got: "Yên bûn sedema ku em li vê qadê ne, kesên ku bûn sedema kuştin û windayan in. Ev kes dengê me dibihîzin. Sala 2016'an wekî tunêleke tarî ye. Em dê di sala 2017'an de bi têkoşîna hevpar biçin dawiya tunelê û xwe bigihînin ronahiyê."

**XIZMÊN WINDAYAN**

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Amedê û xizmên windayan ji bo aqûbeta kesên ku di bin çavan de hatine windakirin an jî qetilkirin bipirsin, bi şiara "Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin" cara 412'emîn hatin cem hev. Çalakî ji ber qedexeya OHAL'ê li Salona Konferansê ya ÎHD'ê ya Amedê hat lidarxistin. Serokê ÎHD'ê yê Amedê Racî Bîlîcî di çalakiyê de axivî û diyar kir dewlet ditirse windayan bibîne û hesab bide, sala borî ji bo welatiyên ku li vî erdnîgariyê dijîn bûye saleke biêş. Di vê hefteyê de aqûbeta Mehmet Ozdemîr hat pirsîn. *DÎHABER*

## Ji bo ku saxî bên dîtin têdikoşin

Yek ji xizmên windayan Farûk Eren, bertek nîşanî nîqaşên der barê 3 kesên ku îsal di bin çavan de xwestin bên windakirin û anî ziman ku dîtina Hurşît Kulter, Mujgan Ekîn û Taşkin Yasak cihê kêfxweşiyê ye û di encama têkoşîna hat dayîn de, hatine rizgarkirin. Farûk Eren, birayê Hayrettîn Eren ê di dema darbeya 80'yan de li Tirkiyeyê di bin çavan de yekem kesê hatiye windakirin, bertekên xwe wiha anî ziman: "Ji ber ev mirov bi saxî hatin dîtin, bo çi dê têkoşîn xesarê bibîne. Ma em ji bo mirov winda nebin tê nakoşin? Mesela Hurşît Kulter, çi yanî diviya bê windakirin, hûn vê dixwazin." ENQERE - DÎHABER



## 'Mirin tenê ji bo Tirkiyeyê heye?'

Li Gundê Madenê yê girêdayî navçeya Kufraya Sêrtê, di ocaxa madenê ya aîdê Koma Cînerê di 17'ê mijdarê de hezaz qewimîbû û 16 karker di bin hezazê de jiyana xwe ji dest dabû. Ji bo têkildarî hezaza bû sedema mirina karkeran doza cemaweriyê bê vekirin. Bavê karker Îsmaîl Tekîn, Şemsettîn Tekîn diyar kir ku ji bo ku berpirsyar bên cezakirin, ew ê her cure têkoşîna hiqûqî bidomînin û wiha got: "Serokomar Erdogan li Somayê gotibû, 'di fitrata vî karî de heye' û xwest vê rewşê wek rewşeke normal nîşan bide. Lê di madenên derveyî welat de, wek Tirkiyeyê tim hezaz pêk nayên. Di fitrata madenvaniyê de, mirin tenê ji bo Tirkiyeyê heye?" SÊRT - DÎHABER



## Hê jî lêgerîna ji bo wan didome

Li Mêrsînê di 29'ê kanûnê de ji ber barana zêde lehî rabû. Di lehiyê de 2 kesan jiyana xwe ji dest da û yek jê zarok 3 kes ketin nava pêlên lehiyê û winda bûn. Lêgerîna 3 kesan didome. Di lehiyê de hevjînên bi navê Serkan û Fatma Genç jiyana xwe ji dest da. Zaroka wan a 2 salî Miray Genç û welatiyên bi navê Sultan Uncu û Soner Yilmaz hêj agahî ji wan nayê girtin. Yekîneyên rizgariyê di nav deryayê de lêgerînê dikin. MÊRSÎN - DÎHABER

## Divê sala 2017'an bibe sala serkeftinê



Komîteya Rêveber a Tevgera Şoreşger a Yekbûyî ya Gelan (TŞYG) sala nû li gelan pîroz kir û bi vê wesîleyê hemû şehîdên şoreşê, têkoşîna sosyalîzm û demokrasiyê bi bîr anî.

Di daxuyaniyê de hêza gerîla hate silavkirin ku bi mezinkirina berxwedanê re pêşî li têkoşînê vekir.

Di berdewama daxuyaniyê de hat ragihandin ku li dijî hemû êrîşên di sala 2016'an de hatin kirin, TŞYG û gelan ragihand ku ew bê alternatîf nîn in. Her wiha bang li hêzên demokratîk, jin, ciwan, rêxistinên kedê, saziyên antîfaşîst û gelan hat kirin ku li dijî faşîzmê bibin yek û hesab ji faşîzma TC û AKP'ê bipirsin. TŞYG'ê herî dawî got ku divê sala 2017'an bibe sala têkoşîn û serkeftinê. *BEHDÎNAN - ANF*

## Zerê dev ji rengên xwe berneda

Dayika Zerê ya 100 salî yek ji sed hezaran şahidê hovîtiya li Kurdistanê ye. Zerê di salên 90'î de bûye şahidê şewitandina gundan, valakirin, kuştinên kiryarnediyar. Bi dehan caran JÎTEM û kontrayan bi ser mala wan de girtiye û ji ber cil û bergên gelêrî û rengên kesk, sor û zer rastî îşkenceyê hatiye. Tevî temenê xwe yê mezin zextên dewletê ji bîr nekirine û diyar kir ku kurê wê piştî mala wan tê gulebarankirin çend sal şûnde winda dibe. Zerê û malbata wê bi zorê ji gund tên derxistin û tevî îşkenceya ku dîtiye, aştiyê diparêze.

Dayika Zerê bi lêv kir ku li gundê Mîrtanis ê Colemêrgê hatiye dinê û mezin bûye û ev tişt anî ziman: "Ji ber valabûna gundan em hatin Wanê. Min ne îşkence û ne jî gundê xwe ji bîr nekirine. Zarokên min li qada gund hatin tazîkirin. Jinên ducanî rastî îşkenceyê hatin. Bi ser mala me de digirtin û îşkence li me dikirin. Ne digotin zarok, ne jî digotin jin. Şopên îşkenceyê hê jî li stûyê min hene. Sedema îşkenceya wan jî cil û bergên me yên gelêrî bû." *WAN- ŞÛJIN*



## Li vî welatî edalet kor bûye



Li Zanîngeha Egeyê ya ku tim bi çewisandin, pêkutî û lêpirsînên xwendekaran dikeve rojevê, xwendekarên dema zagona îstîsmara zayendî prosteto kir û bi derbkirinê hatin binçavkirin, ji aliyê rêveberiya zanîngehê ve der barê wan de bi îdiaya "ewlekarê taybet" derb kirine, lêpirsîn hat vekirin.

Di dîmenên hatin bidestxistin de, bi awayekî zelal dixuye ku xwendekar hatine derbkirin. Pêşî xwendekar ji aliyê ewlekariya taybet ve tên astengkirin, rastî heqaret û derbkirina yekîneyên ewlekariyê tên û piştre polîsên sivîl tev li bûyerê dibin. *ÎZMÎR - DÎHABER*

## Daxwaza pêşîlêgirtina komkujiya fîlan

**LI GORÎ NÛÇEYA** ajansa Xinhuayê hikumeta Çînê dê bazirganiya diranên fîlan heta dawiya sala 2017'an bi temamî qedexe bike. Di nûçeyê de hat ragihandin ku bazirganiya li ser diranên fîlan dê qonax bi qonax were qedexekirin û di sala pêş de li dijî bazirganiya li derveyî qanûnan dê operasyon dewam bikin. Bazirganên diranên fîlan, her sal li welatên Afrîkayê rê li ber kuştina bi deh hezaran fîlan vedikin. Bazara herî girîng a van bazirganan jî Çîn e. Li vî welatî, ji bo tipa alternatîf û zêr û ziber, diranên fîlan tên bikaranîn. Her wiha heke bazirganiya diranên fîlan li Çînê bi temamî bê qedexekirin dê komkujiya fîlan li Afrîkayê gelekî kêm bibe. **PEKÎN - ANF**



## Ban Kî Moon xatir xwest

Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Ban Kî Moon ê ku peywira wî ya 10 salan îro bi dawî dibe, serdana Navenda Giştî ya Neteweyên Yekbûyî kir û xatirê xwe ji personelên NY'yê xwest. Ban Kî Moon beriya xatirxwestinê axaftineke kurt kir û da zanîn ku di dema peywira xwe de bûye dengê bêdengan. Antonîo Gûterres dê îro dest bi peywira Sekreteriya Giştî ya NY'ê bike. **NEW YORK**

## Serokê nîjadperest hat mehkûmkirin

Li bajarê Skarabog ê Swêdê serokê koma nîjadperest a bi navê Soldiers of Odin ji ber stranên xwe yên nîjadperest hat mehkûmkirin. Dadgeha Bajar a Sakaraborgê ji ber ku ev kes li ser 'Youtube'ê bi stranên bi navê "Laşfiroş û reşik" , "Şahiya me ya Arî" û "Ez nazî me, nasyonal nosyalîst im" dijminatiya cihû û misilmanan kiriye, 100 saet cezayê karên xizmeta civakî lê birî. **STOCKHOLM**

## Dîplomatên rûs ji Amerîkayê veqetiyan

Dîplomatên rûs ên ku der barê wan de ji aliyê serokê Amerîkayê Barac Obama ve biryara dersînorkirinê hate dayîn, bi malbatên xwe re Amerîka terk kir. Serokdewletê Rûsyayê Valdîmîr Pûtîn der barê vê biryarê de gotibû ku ew ê dîplomatên Amerîkayê yên li Rûsyayê dersînor neke û dê li benda serokê Amerîkayê yê ayende Donald Trump bisekine. Piştî vê yekê Trump jî pesnê Pûtîn dabû. **MOSKOV**

# Mogherînî Cenevreyê tercîh dike

**Federica Mogherînî peymana agirbesta Sûriyeyê û hevdîtinên piştî agibestê yên ku li Astanayê bên destpêkirin nirxand û got ku divê hevdîtînên Astanayê li Cenevreyê berdewam bikin**



Nirxandin û niqaşên der barê agirbesta ku bi garantoriya Rûsya û Tirkiyeyê li gelemperiya Sûriyeyê di navbera rejîma Baas û muxalefetê de hat îlankirin, berdewam dike. Nûnera Bilind a Polîtîkayên Ewlehî û Têkiliyên Derve ya Yekitiya Ewropayê (YE) Federica Mogherînî peymana agirbesta Sûriyeyê û hevdîtinên piştî agibestê ku dê li paytexta Kazakistan Astanayê bên destpêkirin, nirxandin.

Mogherînî diyar kir ku ew wek Yekitiya Ewropayê di nav aliyên banga peymana bidawîkirina şer dikir de bûne û ji ber peymana agirbestê kêfxweş e. Mogherînî da zanîn ku ger peymana agirbestê bi ser bikeve divê hevdîtînên aliyan li şûna Astanayê di bin banê Yekitiya Ewropayê de li Cenevreyê berdewam bikin. Mogherînî anî ziman ku ew ne li dijî hevdîtinên Astanayê ne lê divê armanc ji nû ve destpêkirina hevdîtinên Cenevreyê be. Mogherînî destnîşan kir ku Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çvuşoglu û Nûnerê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyeyê Staffan de Mîstûra bi riya telefonê hevdîtin pêk aniye û ragihandiye ku ya ewil di çileyê de, ya din jî di serê biharê de der barê Sûriyeyê de 2 civînan dê li dar bixin. ***BRUKSEL***



# Artêşa Iraqê li Mûsilê pêşde diçe

Artêşa Iraqê ya ku piştî rawestandina demekê qonaxa duyemîn a operasyona rizgarkirina Mûsilê da destpêkirin, li rojhilatê Mûsilê li dijî çeteyên DAIŞ'ê bi pêş de diçe. Fermandarê artêşa Iraqê Necm Abdullah Cebûrî der barê qonaxa dûyemîn de daxuyaniyek da û diyar kir ku li rojhilatê Mûsilê li dijî çeteyan pêşde diçin.

Cebûrî da zanîn ku ew ê di demeke nêz de kontrolkirina tevahiyê rojhilatê Mûsilê ragihînin û wiha axivî: "Hêzên me ber bi aliyê bakûrê bajar ve jî di nav tevgerê de ne û heta niha zêdetirî 70 çete kuştine. Her wiha Fabrîqeya Dermanan a El Hikmaî hatiye kontrolkirin û ber bi navçeya El Hedbaî ve hêzên me bi pêş de diçin."

Li aliyê din li paytexta Iraqê Bexdayê 2 teqîn pêk hatin. Welatî û hêzên ewlehiyê yên ku çûn cihê teqînê rastî teqîna duyemîn hatin û di encama her du teqînan de 28 kesan jiyana xwe ji dest da û gelek kes jî birîndar bûn. ***MÛSIL- BEXDA***

## Sersalê Ewropa tirsand

Welatên Yekitiya Ewropayê bi armanca ewlehiya pîrozbahiyên sersalê tedbîrên ewlehiyê derxistin asta herî jor. Welatê ku herî zêde tedbîrên ewlehiyê girtin, ji ber êrîşa li dijî bazara Noelê, Almanya bû. Li îstasyonên trênan û balafirgehên Almanyayê tedbîrên ewlehiyê hatin zêdekirin û hejmara hêzên ewlehiyê derket du qatan.

Her wiha li paytexta Fransa Parîsê jî tedbîrên ewlehiyê hatin zêdekirin û li bînayên dîrokî û kolanên bajar ên herî qelebalix hejmareke zêde polîs hatin bicihkirin. Hat ragihandin ku ji bo pîrozbahiyên sersalê li gelemperiya Fransayê 100 hezar polîs hatine peywirdarkirin.

Li paytextên welatên Ewropayê yên wekî Bruksel, Madrîd, Londra û Romayê jî rewş ji yên Berlîn û Parîsê cudatir nîn bû û gelek tedbîrên ewlehiyê hatin girtin. ***AMED***



# Ji bo Katalonyayê dîsa daxwaza referandûmê

Serokê Herêma Katalonyayê Carles Puigdemont di peyama xwe ya sersalê de aşkera kir ku dê di 2017'an de referandûma serxwebûnê pêk bînin. Serok Puigdemont li avahiya Hikumeta Herêmî ya li Barcelonayê bi rêya televîzyonê peyama sala nû da û diyar kir sala 2017'an ji bo gelê Katalonyayê dê bibe saleke girîng û wiha pê de çû: "Em ê bi referandûmeke legal û diyarker siberoja xwe bi awayekî azad diyar bikin."



Herêma Katalonyayê bi nifûsa xwe ya 7,5 milyon herêma herî mezin a Îspanyayê ye. Li Katalonyayê di 2014'an de jî ji aliyê serokê herêmê yê wê demê Artûr Mas ve biryara referandûma serxwebûnê hatibû dayîn. Lê Dadgeha Destûra Bingehîn a Îspanyayê wê demê biryara referandûmê betal kir.

Mas jî li ser vê yekê bang li gel kir ku bi biçin ser sindoqan û bi rengekî sembolîk dengê xwe bi kar bînin. Di vê referandûma sembolîk de ji 6 milyon hilbijêran bi qasî 2,3 milyonan deng bi kar anî û ji sedî 80 dengê alîgirên serxwebûnê derket holê. ***BARCELONA***

# Îstîfaya herî girîng a Swêdê



Sazî û dezgehên çapemeniyê yên Swêdê ji nav girîngtirîn bûyerên ku di 2016'an de li cîhan û Swêdê qewimîn, 12 bûyer hilbijartin. Çapemeniya Swêdê îstîfaya Wezîrê Avahî û Bajarvaniyê yê berê Mehmet Kaplan ê ku bi têkiliyên xwe yên bi rêxistinên cîhadîst û nîjadperest ên tirk re dihat nasîn jî, di nav 12 bûyerên herî girîng de nîşan da.

Kaplanê ku li Swêdê wekî siyasetmedarê nêzî AKP'ê dihat nasîn, ji ber ku wêneyên wî bi serokê Federasyona Komeleyên Karkerên Tirk ên cîhadîst û nîjadperest Barbaros Leylanî re derketin, çend meh berê ji wezîrtiyê îstîfa kir.

Piştî îstîfaya Kaplan Alîkara Serokwezîr û Wezîra Hawirdorê ya ji Partiya Keskan Asa Romson jî neçar ma û îstifa kir. Îstîfaya Kaplan siyaseta Swêdê hejand û gelek alîgirên AKP'ê yên ku xwe di nav rêveberiya Partiya Keskan û Partiya Karkeran a Sosyal Demokrat a Swêdê de bi cih kiribû, ji wezîfeyên xwe hatin girtin. ***STOCKHOLM***

www.arsivakurdi.org



## Sersal li zarokan pîroz kirin

Bi boneya sersala 2017'an, KPC-Demokratîk ji bo zarokên taxê şahiyek li dar xist. Di şahiyê de bi dehan zarok amade bûn û lîstin. Qada şahiya zarokan jî bi wêne û pêlîstokan hatibû xemilandin. Di şahiyê de sînevîzyonek hat pêşkeşkirin şahiyekê bi navê 'Diyariyên Cejnê' ji zarokan hat pêşkeşkirin. Komên stran û dîlanê jî hunerên xwe pêşkeşkirin. Di dawiyê de jî endamên komîteyê diyariyên wekî pênûs, lênûs û amûrên dibistanê li zarokan belav kirin. Şahî bi dîlanê dawî bû. **HELEB**



## Qamişlo ji bo sala nû amade ye

Bi boneya sersala 2017'an li bajarê Qamişloyê kêf û heyecaneke mezin heye. Şêniyên bajarê Qamişloyê jî ji bo xatir xwestina ji sala 2016'an û pêşwazî kirina sala 2017'an amadekariyên xwe dikin. Dikandaran dikanên xwe xemilandine û rêyên sereke yên bajar jî hatine xemilandin. Hêzên Asayîşê jî bendên xwe yên kontrolê zêde kirine û aliyê ewlekariyê de tedbîrên berfireh girtine. Her wiha ji bo hêsankirina karê hêzên asayîşê bang li gel kir ku li tu deveran gelek qelebalix nesekinin. **QAMIŞLO**



## Li Minbicê Bazara Yekşemê hat vekirin

Welatiyên Minbicê piştî rizgarkirinê bajêr, bazarên xwe vedikin. Yek ji wan bazaran bazara yekşemê (Sûk El Sebit) ye. Di roja yekşemê de bi sedan bazirganên Minbicê yên jin û mêr berê xwe didin vê bazarê û cil, madeyên xwarinê, pêdiviyên malê û hwd difiroşin. Şêniyên bajêr jî ji vê bazarê hemû pêdiviyên xwe bi buhayekî erzan dikirin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku çeteyên DAIŞ'ê li vê bazarê bi dehan ciwan bidarve kiribûn. **MINBIC**



## Dewreya Şehîdên Til Berekê bi dawî bû

Bi tevlibûna 21 endamên rêveberiyên xweser ên Hesekê, Til Temir, Serêkaniyê, Şedad, Hol û Zirganê, Akademiya Zanist û Ramana Azad dewreya bi navê Şehîdên Til Berekê dabû destpêkirin. Di dewreyê de waneyên dîroka Kurdistanê, çand û exlaq, ol û civakê hatin dayîn. Bi boneya bidawîkirina dewreyê şahiyek lidarxistin. Berpirsyarên dewreyê di axaftinên xwe de dewre li tevahiya endaman pîroz kirin. Şahiya bidawîkirina dewreyê bi dirûşmeyên bijî berxwedana HSD/YPG/YPJ'ê û bi gerandina govendê bi dawî bû. **HESEKÊ**

**Berdevkê Fermî yê YPG'ê Rêdur Xelîl da zanîn ku hêzên wan bi têkoşîneke bêhempa mohra xwe li sala 2016'an xistiye û ji bo sala 2017'an jî wiha got: "Dê sala 2017'an bibe sala serkeftinê."**

# YPG'ê mohra xwe li sala 2016'an da

BÊRÎTAN SARYA / QAMIŞLO - ANF

Rêdur Xelîl destnîşan kir ku sala 2016'an li rojavayê Kurdistanê bi têkoşîneke dijwar derbas bû. Xelîl diyar kir ku hêzên wan li hemberî dijminên hov ên çeteyên DAIŞ'ê û gelek komên çete yên din têkoşîneke mezin meşandin.

Berdevkê Fermî yê Yêkîneyên Parastina Gel (YPG) Rêdur Xelîl di axaftina xwe ya nirxandina salê de anî ziman ku hêzên wan ji destpêka 2016'an heta niha li dijî çete yên DAIŞ'ê têkoşîneke bêeman da û wiha pê de çû: "Armanca me bi paqijkirina çeteyan, mayînde kirina aştî û aramiyê li herêmê bû. Di vê çarçoveyê de hêzên me û HSD'ê li herêmê pêngavên girîng pêk anîn."



**PÊNGAVÊN GIRÎNG**

Rêdur Xelîl got ku hêzên wan bi pêngavên rizgarkirina herêmê mohra xwe li sala 2016'an daye û hin pêngav wiha bibîrxistin: "Mînak, Minbic paytexta duyemîn a çeteyên DAIŞ'ê bû û hat rizgarkirin. Pêngava rizgarkirina Reqqayê ji xwe em weke tolhildanê dibînin û xwedî wateyeke mezin e."

**XEBATÊN CIVAKÎ**

Têkildarî herêmên hatin rizgarkirin de jî Xelîl wiha axivî: "Li deverên rizgarkirî, saziyên rêveberiya xweser û partiyên siyasî xebatên xwe dikin. Di vê salê de me di navde bi sedan gund, bajar, bajarok û bi sedhezaran mirov, bi qasî 15.000 km2 deverek rizgar kir. Ji van herêman gelek ciwan tevli me bûn û ji bo rêxistinkirina wan jî me akademî vekirin."

**SALA 2017'AN**

Berdevkê Fermî yê YPG'ê Rêdur Xelîl ji bo sala 2017'an jî ev tişt anîn ziman: "Divê sala 2017'an bibe sala fînalê. Em hêvîdarin ku di vê salê de hemû hêzên terorîst li Sûriyeyê têk bibin. Lê em dizanin ku dê bibe saleke dijwar. Em dibêjin ku sala 2017'an dê bibe sala serkeftinê."

## Têkiliyên bi hêzên derve re xurt dibin

**BERDEVKÊ** Fermî yê YPG'ê da zanîn ku bi taybetî piştî rizgarkirina Kobanê têkiliyên wan bi hêzên herêmî û navneteweyî ve xurtir bûne û wiha derbirî: "Bi hêzên koalîsyona navneteweyî re têkiliyeke me di asta herî bilind de çêbû. Me alîkarî ji wan stand û hînî teknîka wan bûn. Li Rojava jî di navbera gelan de yekitiyek heye û ev jî bi têkoşîna hevpar a şervanên kurd, ereb, suryan û hwd. diyar dibe."

## Êrîşên Tirkiyeyê gelekî zêde bûn

**DER BARÊ** êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî Rojava de jî Rêdûr Xelîl ragihand ku Tirkiye di nava 5 salên şoreşê de her cureyên alîkariyê dan komên terorîst û wiha dom kir: "Ji dijminahiya li dijî me qet paşve gav ne avêt. Hemû hevalbendên xwe jî ji bo dijminahiya li dijî kurdan firotin. Tevî bi dehan êrîşên wan jî me li gorî xwesteka wê nekir. Lê bi dehan dosyayên der barê van êrîşan de me pêşkeşî cihên pêwendîdar kir. Tirkiye ger êrîşî herêmên azad bike, ew ê berxwedaneke xurt bibîne."

# Dawiyê li çeteyan tînin

Şer û pevçûnên di navbera şervanên Xezeba Firatê û komên çete yên DAIŞ'ê yên li rojavayê Reqqayê her ku diçe girantir dibin. Di encama pevçûnên ji 30'ê kanûnê heta niha de herî kêm 50 çete yên DAIŞ'ê hatin kuştin.

Qonaxa duyemîn a hembeleya Xezeba Firatê ya ku şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê bi armanca rizgarkirina gundewarên rojavayê Reqqayê dabûn destpêkirin, di roja 22'yemîn de didome. Di çarçoveya pêngavê de di navbera şervanan û komên çeteyan li bajaroka Mahmûdiyê pevçûnên dijwar qewimîn. Hat zanîn ku di encama pevçûnên du rojên dawî de herî kêm 50 çete hatine kuştin.

Her wiha çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku di encama pevçûnan de wesayîteke bombebarkirî, wesayîteke doçkabarkirî û panzêreke çeteyan hatine rûxandin. Şer û pevçûnên li herêmê didomin. *REQA - ANF*



## RAMCO 6 hezar mayin rakirin

Rêxistina Rakirina Mayinan a Rojava "RAMCO" da zanîn ku di nava 5 mehan de 5 hezar û 975 mayin rakirine.

Komên çete yên di dema reva ji Rojava de li gelek deveran bi hezaran mayin çandin. Bi armanca paqijkirina herêmê ji mayinan, di tebaxa 2016'an de Rêxistina Rakirina Mayinan a Rojava (RAMCO) hat avakirin.

Rêxistinê ji dema avakirinê heta niha li herêmê zêdetirî 5 hezar û 975 mayin li herêmên kantonên Cizîr û Kobanê rakirine. Der barê mijarê rêveberê rêxistinê Sîpan Şêrawa anî ziman ku armanca wan parastina sivîlane û got ku ji bo perwerdeya endamên xwe, bi rêxistinên navneteweyî re têkiliyê pêş dixin. **SERÊKANIYÊ - ANHA**

## Rêveberiya xweser çareseriya Helebê ye

Endama Desteya Niştimanî ya Erebî Newal Mihemed da zanîn ku pergala çareseriya Helebê ye.

Newal Mihemed da zanîn ku li taxên hatin rizgarkirin divê komun û meclis werin avakirin û wiha domand: "Nimûneya bakurê Sûriyeyê jî mînakeke rasteqîn û pêşketiye. Ev proje dikare bibe çareseriya Helebê. Mozaîkbûna Sûriyeyê ku di nava gelan de têkiliyên dîrokî afirandine, hêz da têkoşîna hevpar a gelan."

Di berdewamê de Newal Mihemed got ku hemû pêkhateyên li Sûriyeyê dikarin bihevre li dijî terorîzmê şer bikin û wiha pê de çû: "Her wiha herêmên bakurê Sûriyeyê û ji yên din ên Sûriyeyê bi ewletirin. Her wiha jiyana demokratîk lê xurtire. Ji ber ku sîstema nenavendî heye û em dikarin heman sîstemê li Helebê û tevahiya Sûriyeyê pêş bixin." *HELEB - ANHA*

## Tirkiye Dengê Dirbêsiyê asteng dike

Dewleta tirk a dagirker ku bi zextên li ser çapemeniyê di cîhanê de yekemîne niha jî êrîşî çapemeniya Rojava dike. Radyoya Dengê Dirbêsiyê ji ber ku frekansên wê ya 96.9'ê ji hêla Tirkiyeyê ve hate astengkirin, ji destpêka sala 2017'an û şûnde dê bi frekansa 108'ê weşana xwe bike. Radyoya Dengê Dirbêsiyê ji 1'ê çileya 2016'an heta niha bi bernameyên civakî, çandî, siyasî û hwd. û bi zimanên kurdî û erebî, rojane 11 saetan weşan pêşkeş dikir. **DIRBÊSIYÊ**

## ANHA'yê êrîşa AA'yê şermezar kir

Ajansa fermî ya Tirkyeyê Ajansa Anadoluyê (AA) di nûçeyek xwe de îdia kir ku hêzên artêşa tirk rêvebereke Ajansa Nûçeyan a Hawarê girtine û ANHA jî weke ajansa 'terorîzmê' nîşan dabû. Têkildarî mijarê ANHA yê jî daxuyaniyek weşand AA şermezar kir. Di daxuyaniya ANHA'yê de ev tişt hat parvekirin: "AA her tim di weşanên xwe de hemû dezgehên çapemeniyê yên muxalîf weke 'teror' bi nav dike. Em vê êrîşa AA'yê berdewamiya şerê li dijî Rojava dinirxînin. Em vê helwesta AA'yê şermezar dikin." **QAMIŞLO**

www.arsivakurdi.org

## NEYARÊN ÇAND Û ZIMANÊ KURDÎ LI SER KAR IN

# Enstîtuya Kurdî hat girtin

**Dewleta AKP'ê pêla faşîzmê berfireh dike. Herî dawî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Akademiya Ehmedê Xanî, Roboskî-Der jî di nav de deriyên 94 komeleyan hatin mohrkirin**




Wezareta Karê Hundir a Tirkiyeyê di çarçoveya Biryarên di Hukmê Qanûnê de (KHK) deriyê 94 komeleyan mohr kir. Wezaretê demek berê jî deriyê 375 komeleyan mohkiribû. Di nav komeleyên deriyên wan hatin mohrkirin de Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, li Amedê Akademiya Ahmedê Xanî, Roboskî-Der û gelek komeleyên din jî jî hene.

Enstîtuya Kurd ji aliyê rewşenbîrên kurd Musa Anter, Feqî Huseyin Sagniç, Îsmail Beşikçî, Abdurrahman Durre, Îbrahim Gurbuz, Cemşîd Bender, Suleyman Înanoglu û Yaşar Kaya ve di 18'ê Nîsana 1992'an de li Stenbolê hatibû avakirin. Enstîtuyê li dijî bişaftin û tunekirina ziman, li ser wêje, ziman, çanda kurdan lêkolîn dikir û arşîv berhev dikir. Hevserokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Samî Tan anî ziman 20 sal in enstîtu li ser zimanê kurdî xebatên lêkolîn û akademîk dike û ji sala 2006'an vir ve wekî komele xebatên xwe dewam dike.

Tan da zanîn ku enstîtu bi awayekî korsan hatiye girtin û wiha got: "Di çarçoveya KHK'ê de herî dawî biryar hat dayîn ku 94 komele bên girtin lê lîsteya komeleya nehat weşandin. Di lîsteyê kîjan komele hene nayê zanîn. Polîs dikarin xwe bigînin xebatkarên komeleyê, telefona berpirsyarên saziyê li cem wan hene lê agahî nadin kesekê, polîs nîvê şevê keyayê taxê digirin û tên derî mohr dikin. Rewşeke korsanvarî ye, hiqûq nîne li gorî kêfa xwe tevdigerin. Heta niha der barê enstîtuyê de tu lêpirsîn û doz nehatiye vekirin."

**NEYARÊN ZIMAN**

Tan diyar kir ku mohrkirina enstîtuyê helwesteke li hemberî ziman û nasnameya kurdî ye û wiha axivî: "Heta zimanê kurdî û têkoşerên zimanê kurdî hebin em ê xebatên xwe bidomînin. Ev qad nayê belavkirin."

Akademiya Ahmedê Xanî di sala 2012'an de li ser ziman, dîrok û wêjeya kurdî xebatên akademîk dimeşand û deriyê akademiyê ji aliyê polîsan ve hat mohrkirin.

AKP'ê, komeleya Roboskî-Der jî girt, ku ev komele ji aliyê malbatên zarokên wan di Komkujiya Roboskî de jiyana xwe ji dest da bûn, hatibû vekirin. *AMED*

## Komeleyan xeter dibînin

**HIKUMETA AKP'ê ya ku hemû dengên muxalîf qut dike, faşîzma xwe ya li dijî saziyên civakî didomîne. Di çarçoveya biryara OHAL'ê de 94 komeleyên civakî bi îdiaya 'ji bo ewlehiya neteweyî û asayîşê' xetere ne hatin girtin. Ji van komeleyên hatine girtin 24 komele li Wanê ne.**

**Komeleyên li ser daxwaza Wezareta Karên Hundir hatin girtin, bi daxuyaniyekê navên wan hatin aşkerakirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku di 31'ê kanûna 2016'an de xebatên 94 komeleyan hatin rawestandin.**

**Rawestandina xebatên komeleyan wekî ewlehiya neteweyî hat destgirtin û ev tişt hat gotin: "Di çarçoveya biryara OHAL'ê ya xala 11'emîn de, li 20 bajaran komeleyên ji bo yekitiya neteweyî û asayîşê xetereyê derdixin, 42 komeleyên girêdayî FETO, 24 komeleyên girêdayî PKK/KCK'ê, 3 komeleyên girêdayî DHKP-C'ê, 19 komeleyên girêdayî rêxistinên xeter û 4 komeleyên girêdayî DAIŞ'ê jî di nav de bi giştî 94 komele xebatên wan hatin rawestandin." WAN**

## Qeyûm biraziyê Ensarîoglu kir gerînende




Şaredariya Peyasê ya qeyûm tayînî wê hat kirin, hema bêje veguheriye qereqolekê û li gel vê, biraziyê Parlementerê AKP'ê yê Amedê Galîp Ensarîoglu, Fethî Ensarîoglu jî tayînî Gerînendetiya Park û Baxçeyan hat kirin.

Qeyûm roja ewil bi refaqetiya bi dehan polîsî hat avahiya şaredariyê û ji wê rojê ve, hema bêje avahiya şaredariyê veguherandiye qereqolê. Welatî û personelên dema diçin avahiya şaredariya ku hawirdora wê bi wesayîtên zirxî hatine rawestandin û her wiha li her qatên avahiyê jî polîs hatine bicihkirin. Hat diyarkirin ku, li qata 3'yemîn avahiya veser ku li kêleka avahiya şaredaiyê ya odeya qeyûm Kiliç lê ye, ji bilî rawestandina tîmên taybet destûra tu kesî nayê dayîn.

Li şaredariya ku, bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de (KHK) ya di 22'yê mijdarê de hat weşandin gelek xebatkar û gerînende jê hatin îxrackirin, ji Miftîtiya Bajêr, Navenda Perwerdehiya Gel û Qaymeqamtiya Peyasê karmend hatin peywirdarkirin. Piştî alîgirên hevserokatiyê Mehmet Kan, Mahmût Buyukbayram, Aydin Bolkan, Îhsan Avci û Mûstafa Demîr ji peywirê hatin îxrackirin, karmendên ji miftîtî, navenda perwerdehiyê û qaymeqamtiyê anîn, li şûna kesên hatin îxrackirin hatin peywirdarkirin û dîsa gelek kesên ji van deran hatin, li departmanên cuda dest bi kar kirin. Her wiha dîsa hat zanîn ku, meaşê stajyerên ku li şaredariyê dixebitin, ji aliyê qeyûm ve ji sedî 50'î hatiye kêmkirin. *AMED - DÎHABER*




## Şaredariya gel veguherî qereqolê

Beriya bi hefteyekê qeyûm anîbûn ser Şaredariya Xelfetî ya DBP'ê. Piştî girtina hevşaredaran, hefteya bihurî şaredarî ji hêla qeymeqam ve hate dagirkirin û bi rêbazên rayeya leşkerî ve tê birêvebirin.

Kulîlkên li şaredariyê hemû hatin rakirin, qufleyên hemû deriyên yekîne û odeyên şaredariyê hatin guhertin, li têketinê cîhaza X-Ray hate danîn. Sibeh, nîvro û êvarî deriyên xebatkaran ji hêla polîs ve têne vekirin, her dema ku derdikevin polîs digirin. Di pey re yek bi yek qeydên hemû personelan hatin wergirtin.

Personel saet 08.00'an îmze davêjin û dikevin şaredariyê, personel tenê di navbera nîvro de dikare derkeve, êvarî piştî qedandina mesaîyan dikare ji odeya xwe derkeve. Midûrê karê nivîsê yê qeyûm tim xebatkaran kontrol dike. Şaredarî weke girtîgeheke vekirî tê birêvebirin, mirov dikare bibêje ku bi qanûnên leşkerî tê birêvebirin. Beriya qeyûmê gel tim ji bo ziyaretê diçû şaredariyê, niha ji bo karê resmî jî naçe. *RIHA*

## Tenduristiya Ahmet Turk xirabtir bû

Parêzer Erdal Kuzu û Parlamenterê CHP'ê Şafak Pavey, piştî li Girtîgeha Silivrî Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk ziyaret kirin diyar kirin ku tenduristiya Turk her diçe xerab dibe û ji ber vê yekê bi fikar in.


Li gorî nûçeya rojnameger û nivîskara Cumhuriyetê Ayşe Yildirim di çavê Turk ê rastê de nexweşiya kataraktê pêş ketiye.

Di nûçeyê de Kuzu diyar kir ku bijîşkan xwestiye ku Turk ji çavê xwe emeliyat bibe û ger emeliyat nebe dê nexweşî lê giran bibe, lê li girtîgehê ew şert ne pêkan in. Kuzu, da zanîn ku Turk di hevdîtinê de nexwestiye ku tenduristiya xwe bîne. Kuzu, anî ziman ku der bare Turk de raporek neyînî derkeve dê serî li Saziya Tipa Edlî bidin lê zêde ji vê saziyê jî ne bi hêvî ne. *STENBOL*



## Dê li pey rastiyan bibezin

Di 16'ê tebaxa 2016'an de polîsan bi ser Rojnameya Ozgur Gundemê de girtibû. Di vê serdegirtinê de Gerînendeyê Weşana Giştî yê rojnameyê Zana Kaya ji aliyê polîsan ve bi derbkirinê hatibû binçavkirin û paşê bi îdiaya "Endamê rêxistinê" hatibû girtin û ew şandibûn Girtîgeha Silîvriyeyê.



Zana Kaya piştî ku serbest hat berdan diyar kir ku ji bo deynê xwe yê civakî bidin dê karê xwe bidomînin û wiha got: "Li derve xwegihandina dostan xweş e, lê ji aliyekî ve jî derve bi çewisandin û pêkûtiyan veguheriye hundur. A rast, temamiya Tirkiyeyê veguheriye girtîgeheke vekirî. Bi rastî jî, hawirdorê welat bi dîwaran hatiye dorpêçkirin û bûyeke girtîgeheke mezin. Tabî ev pêvajoya têkoşînê ye. A girîng ew e ku, mirov têkoşînê mezin bike û li pêyî rastiyê bibeze. Em jî rojnameger in û em ê karê xwe pêk bînin. Ji bo em rastiyan ragihînin civakê, deynekî me heye. Ji bo dayîna vî deynî jî, em ê îcrakirina karê xwe bidomînin." *STENBOL - DÎHABER*

### 143 rojnameger girtî ne

**CEMIYETA Rojnamegerên Tirkiyeyê (TGC) rapora 2016'an aşkere kir. Li gorî raporê kartên 780 rojnamegeran ên çapemeniyê hatin betalkirin, 839 rojnameger derketin pêşberî dadger. 189 rojnameger rastî tundiya fizîkî û devkî hatin. 143 rojnameger girtî ne. Zêdeyî 10 hezar rojnameger jî betal in. 157 weşan hatin girtin. Di 14 bûyerên civakî de qedexeya weşanê hat îlankirin. Rojnamevan Ahmet Şik ê ku bi hinceta nûçe û tweetên wî yên li ser tevna civakî hatibû binçavkirin, hat girtin. Şik, herî dawî li ser hesabê xwe yê Twîtterê gotibû, "Ez têm binçavkirin. Têkîldarî tweetekê wê min bibine gel dozger."Ahmet Şik, demek beriya niha dabû xuyakirin ku ji hêla AKP'iyekî tê tehdîdkirin. STENBOL**

## Rojnameger nehatin jibîrkirin

**Bi banga "Însiyatîfa Ez Rojnameger im" zêdetirî 100 rojnamegerên ku hatin cem hev ji bo ku hevalên xwe yên di girtîgehan de ji bîr nekin, bi hev re wêne kişandin û silavên xwe şandin ji hevalên xwe yên girtî re. Rojnamegeran ji hevalên xwe yên rastî cezeyê qedexekirina name û ragihandinê hatine re di sersalê de silava komî şandin. Rojnameger Ahmet Şik ê ku di wêneyê de cih digire jî îro dê silava xwe li girtîgehê wergire. STENBOL**

www.arsivakurdi.org

# Divê Ocalan di nav gelê xwe de be


Welatiyan ji bo rawestandina tecrîda li ser Ocalan bang kir û diyar kirin ku ew Ocalan wek mifteya rawestandina şer dibînin û wiha got: "Divê Ocalan di nav gelê xwe de be."

Herî dawî di 11'ê îlona 2016'an de birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo hevdîtinê çûbû Girtîgeha Îmraliyê û ji wê rojê ve tu agahî ji Ocalan nayên wergirtin. Welatiyan ji bo dawî li tecrîda Îmraliyê bê, banga pêkanîna muzakereyan kir.

Welatiyê bi navê Ramazan Canbulut (45) ê xwest dawî li tecrîda li ser Ocalan bê wiha got: "Em ê hemû xesarê ji vê bibînin. Dê tirk û kurd xesarê ji vê bibînin. Em hemû alîgirên aştiyê ne. Divê ev agir bitefe." Alî Şen ê 65 salî jî diyar kir ku mijara tecrîdê mijareke pir zor e û got tenê tecrîd ne li ser Ocalan, li ser hemû Kurdistanê heye. Şen wiha pê de çû: "AKP û MHP dixwazin kurdan tune bikin. Kes ji vê re nabêje na. Ev her du partî, li pêş kurdan asteng e. Naxwazin kurd tu mafî bi dest bixin.

**RÊBERÊ GEL E**

Seyfî Ugurlu yê 30 salî destnîşan kir ku weziyeta Ocalan weziyeteke 'Rêberî' ye û wiha got: "Divê Ocalan ne li girtîgehê, di nav gelê xwe de be. Siyaseta Ocalan baş e. Tecrubeya wî heye. Kêm mirov wek Ocalan zane hene." Ugurlu wiha domand: "Çareserî, aştî û



diyalog e. Divê tirk û kurd ji hev fêm bikin; heke na çareserî çênabe. Em du gel in ku bi hezaran sal e li gel hev dijîn. Ez fêm nakim, doza çi li kurdan dikin. Têkiliya bazirganî ya kurdên Iraqê bi Tirkiyeyê re heye. Ji çiyê kurdan ditirsin fêm nakim."

Murat Gulmez (32) jî got, "Em Ocalan wek mifteya rawestandina şer dibînin" bi bîr xist ku bi salan e li Tirkiyeyê şerek heye û bal kişand ser rewşa Ocalan a şer rawestandinê. Gulmez wiha got: "Pirgirêkeke gelê kurd a divê bê çareserkirin heye. Di çareserkirina vî şerî de, rol û rista Ocalan girîng e. Di warê aştiyê de kesekî bibandor e. Divê Ocalan demildest bê berdan. Divê demildest dawî li tecrîdê bê. Dema pevçûn hebin, aborî xerab dibe, cenaze tên. Ji bo tu gelî jî, şer ne heta hetayê ye. Em Ocalan wek mifteya rawestandina şer dibînin. Divê dewlet demildest li gel wî rûne û biaxive."

**ÇARESERÎ YEKITÎ YE**

Fatîha Toprak got, Ocalan di nav şert û şirûtên tecrîdeke giran de ye û wiha got: "Wek dayikekê ez pir xemgîn im." Toprak banga divê demildest dawî li tecrîdê bê kir û wiha got: "Em dixwazin Tirkiye wî wek rêber qebûl bike." Toprak herî dawî wiha bang kir: "Her kesê dibê ez mirov im, li heq û hiqûqê digerin, digirin. Çareserî di yekitiya kurdan de ye. Heke yekitî tune be, çareserî zehmet e." *STENBOL- DÎHABER*

## Bila bibe sala yekitiyê

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bi hêviya ku di sala nû de kurd Kongreya Neteweyî pêk bînin, sala nû li hemû gelên berxwedêr pîroz kir. KCD'ê di peyama sersalê de wiha got: "Di vê pêvajoya dîrokî de, ku çarenûsa gelan lê diyar dibe, ji bo gelê kurd mijara herî jiyanî û girîng avakirina yekitiyê ye. Vê yekê careke din bi me da nîşandan ku bê avakirina yekitiya kurdan a di vê pêvajoyê de çi qasî jiyanî û girîng e. Li ser vê bingehê hêvî û bawariya me ew e ku sala 2017'an di aliyê gelê kurd de avakirina yekitiya neteweyî gelekî girîng e û Kongreya Neteweyî ya ku ev demeke di rojeva kurdan de ye, pêk were." **AMED**

## Li Başûr sala krîzan bû

Hiqûqnas Abdurrahman Xelîfe da xuyakirin, ku di sala 2016'an de krîza li Başûrê Kurdistanê girantir bû û diyar kir, ji ber ku partiyekê qanûn tune hesiband û parlament bê kêr kir, krîz girantir bû. Xelîfe ji aliyê siyasî ve sala 2016'an bi vî rengî nirxand: "Mirov dikarin bibêjin saleke welê bû ku hikmê rêveberiya meşrû nema û partiyekê bi zorê desthilatdariya xwe ferz kir. Vê rewşê krîz girantir kir û gel xist nava rewşa bêhêvî. Ji ber ku pêşiya mirovan nediyar bû û xumamî dihat xuyakirin, sal bi krîzan derbas bû." Abdurrahman Xelîfe bi bîr xist ku hikumet ji PDK, YNK, Tevgera Goran, Yekigrtû Îslamî û Komala Îslamî pêk tê û got, "Lê belê bepirsyarî herî zêde li ser milê hevkarê herî mezin ê desthilatdariyê ye. Ew jî PDK ye." **HEWLÊR**

## Faşîzm dê têk biçe

Hevserokatiya KONGRA GEL daxuyaniyeke nivîskî weşand û sala nû pîroz kir.

Hevserokatiyê da xuyakirin, ku di sala 2016'an de faşîzma dewleta tirk bi her şêweyên hovane xwest vîna vîna gelê kurd bişikîne û wiha got: Sedema êrîşa dijwar a faşîzma dewletê ew e, ku li pêşberî van gavên şoreşî tengav bûye. Bi xurtkirina têkoşînê re krîza siyasî û aborî wê kûrtir bibe û faşîzma Erdogan-Bahçelî serberjêr bibe. Bila kes ji vê gumanan neke. Ji ber vê yekê sala 2017'an wê bibe sala ku berxwedan gihîştiye asta herî bilind."




KONGRA GEL da zanîn ku dê 2017 bibe sala berxwedan û azadiyê û wiha got: "Li ser bingeha; sala 2017'an ji bo azadiya Rêber Apo, gelên Kurdistan û Tirkiyeyê bibe sala aştî û demokrasiyê, em sala nû di serî de li Rêber Apo, hemû hevrêyên xwe yê li her qada jiyanê li ber xwe didin, li gelên Kurdistanê yên li her çar parçeyan û mirovahiya pêşverû pîroz dikin. Di sala 2017'an de em ê faşîzma dewleta tirk têk bibin, hem ji bo gelên xwe hem jî ji bo mirovahiyê serdemeke nû ya dîrokî bidin destpêkirin. Bi vê bîr û baweriyê em daxwaza serketinê ji gelên xwe yên berxwedêr û hemû hevrêyên xwe dikin." *BEHDÎNAN - ANF*

## Bi boykotê ketin sala nû

Li Silêmaniyê mamoste çalakiyên boykotê didomînin. Mamostayan diyar kir ku heya daxwazên wan pêk neyên, wê boykota wan bidome.

Endamê Meclisa Mamostayên Nerazî yê bajarê Silêmaniyê, Behmen Ehmed wiha got: "Boykot didome, heya daxwazên me pêk neyên em ê neçin dibistanan û dergehên dibistanan venekin." Behmen Ehmed got ku ew dibistanên hatine vekirin, ji ber ku tu pêwîstiyên xwendekaran nehatine pêkanîn.

Serokê Yekitiya Kêmendamanan Saman Hisên ragihand ku di sala 2016'an de tenê 5 mûçe wergirtine û got ku mûçeyên 7 mehan jî qet wernegirtine. *SILÊMANÎ*

## 'Rojên xweş li pêş me ne'

Hevserokên HDP'ê yên girtî Fîgen Yuksekdag û Selahattîn Demîrtaş peyama sersala nû da. Mesaja hevserokan wiha ye: "Em dizanin ku li pêş me rojên xweş hene. Ji bo ku 2017 bibe sala hêzên demokrasî, aştî, ked, azadî û wekheviyê bibin yek; ji bo gel bibin daxwazkarên dadmendiyê em ê tê bikoşin. 2017'an her roj em ê bihilin û bimeşin, jiyan û rasteqînî wê li girtîgehan nesekinin. Em hêvî dikin ku 2017 ji bo hemû gel, bawerî, kedkar, çewisandî, malnişîn, jinan û ciwanan bibe saleke tijî serkeftî û destkeftiyên civakî pêk hatine. Ji bo saleke aram, aştî lê serwer û bikaribin jiyanê pîroz bikin, em we hemûyan bi hurmet, hezkirinê silav dikin." **AMED**

## KNK'ê sala nû pîroz kir


Konseya Rêveber a KNK'ê bi hêviya aştî, aramî û azadiyê sala nû li kurdan, gelên kurdistanî û cîhanê pîroz kir. KNK'ê wiha got: "Hêvî dikin sala nû, sala 2017'an bibe dema vê xewn û xeyala geş ya gelê me. Sala nû bila ji bo mirovahiyê pêk ve bibe dema aştî, tenahî, azadî, demokrasî û wekheviyê. " **BRUKSEL**

## Ji Tuncelê peyama têkoşînê

Hevseroka DBP'ê Sebatat Tuncel, ji Girtîgeha Silîvrî ya Tîpa F peyama sersalê weşand. Peyama Tuncel wiha ye: "Serdema pêş me têkoşîna siyasî divê bêhtir were çalakkirin. Di vê çarçoveyê de berpirsyariyeke girîng dikeve ser partiya me. Bi vê wesîleyê ez sersala gelê me pîroz dikim." **AMED**

Fanos

## Derdê AKP'ê bi kurdan re ye



M. Emîn Yildirim

Pirsgirêk dema dibe pirsgirêka bidestxistina statu û azadiya gelê kurd Tayyîp Erdogan û dewleta AKP'ê tawîza ku nedin, tiştê ku nefiroşin û pêşkêş nekin, tune ye. Siyaseta dewleta dagirker a AKP'ê bi temamî li ser vê eksenê ye. Mirov wisa fêm bike, tiştekî pêwîst e û ne şaş e. Hemû derd û armanca dewleta dagirker a AKP'ê ew e ku gelê kurd azad nebe û nebe xwedî statu.

Erdogan û AKP heta beriya vê der barê dewleta Rûsya û Sûriyeyê de tiştê ku negotiye û heqareta ku nekiriye nîn e. Lê di roja îro de bi şêwazekî bi dewleta Sûriyê re rojane di nava têkiliyê de ye. Jixwe bi dewleta Rûsya re jî li ser rewşa Sûriyê di pir xalan de li hev kirine. Erdogan û AKP resmen tawîz dan Rûsyayê û bi nepenî çi firotin û çi pêşkêş kirin nayê zanîn. Tenê ji bo projeya gelê kurd ya Sûriyeyeke demokratîk û Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê bi pêş nekeve û encam negire, îxanet li şirîkên xwe re kir. Heleb firotin. Rûsya, rejîm û Îranê ji bo berjewendiyên xwe ev tawîzên ku AKP'ê dan ji bo xwe pêwîst dîtin. Wek encam gihaştin biryara agirbestê. Lê dewleta Tirkiyeyê bila xwe nexapîne, heta niha pir civînên navneteweyî li ser Sûriyeyê pêk hatin û pir biryarên wekî agirbestê hatin îlankirin. Lê hemû nîvçe man, vala derketin û encam negirtin. Guman heye ku ev agirbest û projeya li ser vê tê birêxistinkirin jî dê nîvço bimîne û encamê negire. Lê pêwîst e Rûsya jî xwe nexapîne. Baş bizanibe ku Tirkiye ji endamên NATO'yê yên herî sereke ye. Ji sedî 41 aboriya xwe li ser Ewropayê pêk tîne. Weke konjonkturel hem Rûsya hem jî dewleta Tirkiyeyê dikarin hev bi kar bînin û ji hev îstîfade bikin. Dîsa pêwîst e ku dewleta Rûsya jî ji bîr neke ku di sekna dewleta Tirkiyeyê de tu caran hevgiriyek tune ye. Her wiha dewleta Rûsya ji ber nakokiyên bi Amerîkayê re û ji ber hinek berjewendiyên xwe divê hebûn û azadiya gelê kurd neke qurbanî. Êdî realîteyek e ku gelê kurd li ser axa Sûriyeyê hêzeke dînamîk, birêxistinkirî û xwedî bandor e. Ji ber şoreşa ku pêk hatiye, bedelên hatine dayîn ew û tu caran gelê kurd rexne û dagirkeriya dewleta tirk qebûl neke û serê xwe netewîne.

Sedema ku dewleta Tirkiyeyê dixwaza Babê dagir bike, bêguman ji bo têkçûna şoreşa Rojava ye. Beriya her tiştî jî kantonên Rojava nebin yek. Dibe ku dewletaTirkiyeyê demkurt di vê noqteyê de bibêje min encam girt. Lê sedem her çi be jî dagirkerî ne rewa ye. Li ser axa Sûriyeyê ew ê nikaribe mayînde bibe. Wexta ku DAÎŞ bê tasfiyekirin herhalde dewleta Rûsya, Sûriye û Îran ew ê nebêjin ku dewleta dagirkeriya tirk her tim li ser axa Sûriyeyê be. Îhtimala pir mezin ew e ku bibêjin karê te xilas, ji kerema xwe re bizivire.

Di milê din de gelê kurd divê di mejiyê xwe de her tim dîrokê zindî bigire. Dibe ku îhtimaleke zeîf be, lê carinan dîrok xwe dubare dike. Em tu caran ji bîr nekin ku dema pirsgirêk û mijar dibe gelê kurd dewletên dagirker ên herî dijberî hev jî wext tê siyaseta xwe dikin yek. Ji bo vê jî divê pirsgirêka gelê kurd bi perspektîfa dîrokî, bi gumana zanistî rewşa heyî û pêşerojê bigire dest, gav biavêje û encamê bigire.

*Têbinî: Sersala we pîroz be û bi hêviya sala 2017'an bibe sala azadiyê.*

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
1 Çile 2017 Yekşem

# ‘2017 wê bibe sala azadiya gelan’

**Gerîlayên HPG û YJA Starê diyar kir ku di sala 2016’an de konsepta tunekirinê ya dewleta tirk hatiye têkbirin û ev nirxandin kir: “Bi têkoşîna gelê kurd, dê gelên Rojhilata Navîn ber bi azadiyê ve bimeşin.”**


ŞERVAN NÊRGIZ - RIZGAR AMED / BEHDÎNAN - ANF



Alan Malazgîrt



Mizgîn Umut



Şevger Tolhildan

Gerîlayên HPG û YJA Starê diyar kir ku dewleta tirk li hemberî têkoşîn û berxwedana gelê kurd û Tevgera Azadiyê ya Kurd têk çûye. Gerîlayan anî ziman ku sala 2017’an dê bibe sala azadiya gelê kurd, Ocalan û gelên Rojhilata Navîn.

Gerîlaya YJA Starê Mizgîn Umut derstnîşan kir ku sala 2016’an ji bo gelê kurd saleke zehmet bû û ev tişt anî ziman: “Dewleat tirk a mêtinger li hemberî bexwedana gerîla bi bin ket. Sala 2016’an bû sala polîtîkayên li dijî gelê me û tecrîda giran a li dijî rêberê me. Lê belê gerîla li pêşberî pêkanînên faşîzan ên dewleta tirk bê bersiv nema. Berxwedana gel û gerîla tirs xist dilê dewleta tirk. Di sala nû de jî dê polîtîkayên şîdetê yên li dijî gel û rêberê me bê bersiv nemînin. Çalakiyên me yên li dijî vê dê zêde bibin.”

**PLAN TÊK BIRIN**

Gerîlayê HPG’ê Alan Malazgîrt jî diyar kir ku dewleta tirk di sala 2016’an de xwest destkeftî û hebûna gelê kurd tune bike û axaftina xwe wiha domand: “Di bin navê ‘Plana têkbirinê’ de êrîşî qadên xwerêveberiyê yên gelê kurd kir. Bi vê yekê xwest gelê kurd û bajarên wî ji holê rake. Lê belê di sala 2016’an de tevgera me bi berxwedan û çalakiyên xwe pêşî li van planên dewleta tirk girt. Dewleta tirk li pêşberî berxwedana gel û gerîla têk çû û ket nava tirs û xofê.”

**SALA AZADIYÊ**

Di berdewamê de Malazgîrt daxuyand ku di sala 2017’an de wek gerîlayên HPG û YJA Starê ew ê berxwedana xwe mezin bikin û ev tişt anî ziman: “Sala 2017’an dê bibe sala azadiya Rêber Apo û gelê kurd. Armanca me têkbirina planên dewleta tirk e û bersivdayîna êrîşên li dijî gelê me ye. Di sala 2017’an de em ê ji kêmasiyên xwe tecrûbeyê derxin û têkoşîna xwe bi ser bixin. Em ê gelê xwe û rêberê xwe azad bikin.”

**DEWLETA TIRK TÊK ÇÛ**

Gerîlayê HPG’ê Şevger Tolhildan jî der barê mijarê de got ku sala 2016’an li çar parçeyên Kurdistanê bû saleke berxwedanê ya gelê kurd û bi bîr xist ku li bakurê Kurdistanê dewleta tirk bi ‘planên têkbirinê’ bi rengekî hovane êrîşî gelê kurd û bajarên Kurdistanê kir. Tolhildan da zanîn ku gelê kurd bi berxwedaneke dîrokî bersiv da êrîşên dewleta tirk û wiha pê de çû: “Planên dewleta tirk li pêşberî vê berxwedanê pûç bûn. Her çi qas bi hovane êrîş kir jî, nekarî li hemberî berxwedêran xwe bigire. Dewleta tirk a ku nekarî xwe li hemberî destkeftiyên gelê kurd ên li Rojava ragire, bi awayekî hovane êrîşî rojavayê Kurdistanê kir. Lê belê tevî van hemû êrîşan jî li pêşberî berxwedana mezin têk çû.”

Şevger Tolhildan bi lêv kir ku sîstema demokratîk a li rojavayê Kurdistanê li dijî sîstema netewedewletê hatiye afirandin, bûye çavkaniya hêviyê ji gelên Rojhilata Navîn re û wiha bi dawî kir: “Dê sala 2017’an ji bo gerîla û gelê kurd bibe saleke cuda. Sala 2017’an dê bibe sala azadiya rêberê me û gelê me.”

**KONSEPTA TUNEKIRINÊ**

Têkildarî mijarê gerîlayê HPG’ê Rodî Roj jî daxuyand ku di sala 2016’an de ji bo tunekirina gelê kurd konseptek hate amadekirin û ev nirxandin kir: “Ev konsept li pêşberî Tevgera Azadiyê ya Kurd têk çû. Sala 2016’an ji bo me bû saleke destkeftiyan û saleke dijwar. Êrîşên hovane yên hêzên faşîst ên li dijî gelên me yên li Şengal, Rojava û bakurê Kurdistanê, rastî têkoşîn û berxwdana gel û gerîla hat û bi têkçûneke mezin re rû bi rû bû. Têkoşîna fedayî ya hevalên me, dijmin hejand û tirs berda nava dilê dijmin.”

**RONESANSA GELAN**

Di dawiya axaftina xwe de jî gerîla Rodî Roj ev tişt got: “Bi têkoşîna gelê kurd, dê gelên Rojhilata Navîn ber bi azadiyê ve bimeşin. Niha li Rojhilata Navîn bihara kurdan heye. Li Rojhilata Navîn Ronesans heye. Ev yek ji aliyê kurdan ve hat destpêkirin. Di sala 2017’an de ev çirûska hate pêxistin dê xwe bigihîne azadiya Rêber Apo û têkoşîna gelan a azadî û demokrasiyê dê li dijî feraseta teokratîk, olîgarşîk, neteweperestiya dewletan, bi ser bikeve. Ev sal dê bibe sala jiyana azad a bi hev re ya gelan.”

# Tirkiye û peywira wê ya Rojhilata Navîn

NAZDAR EBDÎ / QAMIŞLO - ANHA



Xurtkirina têkiliyên Tirkiye, Rûsya û Îranê dikarin di çarçoveya qutbûna Tirkiyeyê de ji sîstema hegemonyaya Îsraîl û Amerîkayê jî bên nirxandin.

Geşedanên niha li Rojhilata Navîn, hejandina hevsengiyên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn û bi taybet xurtbûna têkiliyên Tirkiye, Rûsya û Îranê, di pêşdîtinên Ocalan de derbas bûbû. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev yek di bin sernavê ‘Hûnandina Komara Tirkiyeyê’ de di beşa heftemîn a parêznameya Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk de digot.

Ocalan di vê serbenda parêznameya xwe de, makanîzmeya derketina komara Tirkiyeyê li ser xirabeyên împaratoriya osmanî û avakirina hevsengiyên li Rojhilata Navîn piştî şerê cîhanê yê yekemîn vedibêje. Ocalan di vê mijarê de wiha dibêje: “Li Rojhilata Navîn a ku Ingilistanê dixwest ji nû ve birêkûpêk bike, yek ji stûnên sereke yên sîstema dewleta netewe ya mînîmal Komara Tirkiyeyê ye.Tirkiye, li ser rêya biçe damezirandina Îsraîlê wek dewleteke pro-Îsraîlê hat hûnandin. Meseleya Mûsil-Kerkûkê (parçekirina Kurdistanê) di vê mijarê de wek qeraseyekê hat bikaranîn.”

Di vê çarçoveyê de, Ocalan pêşketinên li herêmê piştî hilweşîna osmaniyan û vesazkirina hevsengiyên nû, derketina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê ku di 1’ê çileya 1913’an de desthilatdarî xist destê xwe, bi bûyereke di sala 1914’an de ketin Şerê Cîhanê yê Yekemîn, li ser bingeha peymana Sykes-Picot Ingilistan û Fransayê Rojhilata Navîn di navbera xwe de parve kir. Deklarasyona Balfourê (plana avakirina Îsraîlê) 1917, li Filistînê avabûna mandakariya ingilîzan, îlankirina Meclisa Gel a Mezin a Tirkiyeyê (TBMM) di 1920’an de, qebûlkirina peymana Lozanê dewleta netewe ya tirk a spî komargeriya neteweya demokratîk tesfiye kir û dîktatoriya CHP’ê ava kir. Di 1925’an de bi provokekirina Şêx Seîd pêvajoya tevkujiyên kurd dest pê kir (1925-1938). Hevgirtina Ingilistan û Komara Tirkiyeyê (1939), damezirandina Îsraîlê ku bi awayekî fermî hat îlankirin (1948). Komara Tirkiyeyê ket NATO’yê (1952). Darbeyên 1960, 1971, 1980, 1993,1998’an û herî dawî darbeya Ecevît û anîna AKP’ê ya hikumetê 2002’an, wekî din bûyerên wekî Şerê Kendavê yê Yekemîn (1990) û Duyemîn rêz kirin û gelek bûyerên wiha wek xelekên bi hev ve girêdayî di çarçoveya Îsraîlê de û kûrkirina hegemonyaya DYA’yê de nirxandin.

Di pirtîka xwe de Ocalan diyar dike ku bûyerên paşê qewimîn hemû di çarçoveya stratejiya Komara Tirkiyeyê de wek dewleta netewe bê avakirin û mîsyona duyemîn a danîn pêşiya wê ew bû ku diviyabû pêşî li belavbûna Rûsyaya Sovyet a li Rojhilata Navîn bigire û li Tirkiyeyê nehêle komunîzm bi pêş bikeve. Polîtîkaya hundir û derve ya Tirkiyeyê li gorî van her du armancên bingehîn pêk hatibû.

**QUTBÛNA TIRKIYEYÊ!**

Ocalan hewldanên Tirkiyeyê jî wiha şîrove dike: “Tirkiye xeleka qels a sîstemê ye. Lewma qutbûna wê ya ji sîstemê îxtîmaleke qels nîn e. Qutbûn dikare di du çarçoveyan de pêk bê. Ya yekê, ger ne xapandin be, bi Îran, Sûriye û heta Rûsya û welatên wekî Brezîlya, Hindistan û Çînê re hewl bide bibe hêza herêm heta hêza hegemonyaya DYA, Ingilistan û Yekitiya Ewropayê rabe. Ya duyem jî ger Komara Tirkiyeyê hevgirtinên xwe li ser bingeha neteweya demokratîk aktualîze bike, qutbûna duyemîn mumkin dibe.”

## Hatina AKP’ê çawa bû?

**MIROV** di nirxandina Ocalan digihîje ku rola ku paşê hêzên hegemon da AKP’ê ew bû ku neteewperestiya şiî ya Îranê, îslama radîkal a ereban û neteweperestiya laîk, nerm bike. Lê wisa xuya bû ku hatina AKP’ê li ber vê têr nebû û xwest ku zêdetir parê bigire. Ocalan vê mijarê jî wiha dinirxîne: “Ango AKP’ê ya ku ji aliyê sêbera DYA, Ingilistan û Îsraîlê ve ji bo hegemonyaya Rojhilata Navîn xizmetê bike, hatiye çêkirin, di berdêla xizmeta xwe de dixwaze para wê bê zêdekirin. Îsraîl jî li hemberî dixwest ku daxwazên xwe kêm bike. Nakokiyên wan di vê derbarê de jî rast in lê dikarin di nav sîstemê de çareser bikin. Di dema navîn û dirêj de bivê nevê AKP dê bi sîstema hegemonîk re bi temamî li hev

## Derbeya Gladioyê

**JI SALA** 1979’an ve ji 2 milan ve li dijî sîstema hegemon xetere hebû, ji aliyê Rûsyaya Sovyetê û Îrana îslamî ve. Van sedemên derve û muxalefeta neteweya demokratîk a hundir, dikir ku Tirkiye veguhere. Ocalan di berdewamê de wiha dibêje: “Ji ber van, li gorî berjewendiyên sîstemê bû, Gladio derbeya 12’ê Îlona 1980’yan pêk anî. Ji bo vê Gladio bi hêz bû û senteza îslama tirk a nerm ji bo rêgirtina li hember her du xetereyan derket. Komara Tirkiyeyê ya duyemîn ava bû. Gladio bi komara duyemîn re bi awayekî bingehîn bersiva xetereyên dualî yên hundir û derve da. Hem bersiv da radîkalîzma îslama Îranê û tevgerên neteweya demokratîk jî wê bi terora faşîst tune bikira.”

## Derbeya 15’ê tîrmehê

**OCALAN** paşê bal dikişîne ser ixtîmala ku Tirkiye serhişkiyê bike û bixwaze bi Îran û îslama radîkal û nerm re hevgirtinan saz bike û zorê bide sîstema hegemonîk û heya xwe bike sîstemeke hegemonîk. Ocalan wiha didomîne: “Hingê çi hatibe serê CHP’ê dê bi ser AKP’ê de jî bê.” Hewldana derbeya 15’ê tîrmehê mirov dikare di vê çarçoveyê de bi bîr bixe.

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
1 Çile 2017 Yekşem

# Sersala we 2017 pîroz be

**Her şar û komel bi kultur, huner, edebîyat û ziwan, nasname û statuya xo esto. Şarê kurd zî bi serran o seba kultur û hunerê xo, edebîyat û ziwanê xo, nasname û statuya xo tekoşîn dano. No têkoşîn û xoverdayîşê şarê kurdî çar parçeyanê Kurdistanî de resayo duştê tewr berz yê serkewtişî. Me serra 2016 pey xo de verda û ma derbazî serra 2017 benî. Ma hêvî kenî ke na serre biba serra serkewtiş û azadî. Ma serrneweyê şarê xo pîroz kenî...**

***

**Her gel û civak bi çand û huner, wêje û ziman, nasname û statuya xwe heye. Gelê kurd jî bi salan e ji bo çand û hunera xwe, wêje û zimanê xwe, nasname û statuya xwe tê dikoşe. Ev têkoşîn û berxwedana gelê kurd li çar aliyên Kurdistanê gihaştiye asta herî jor a serkeftinê. Me sala 2016'an li dû xwe hişt û em derbasî sala 2017'an dibin. Bi hêviya ev sal bibe sala serkeftin û azadiyê, em sersala gelê xwe pîroz dikin...**

**tmmob**

***Pêkhateyên TMMOB'ê yên Amedê***

www.arsivakurdi.org

## Hûmara 50. ya kovara Vateyî vejîya




MERKEZÊ XEBERAN

Kovara Vateyî ke serra 1997î ra nata bi hawayo nîzamin vejîyena, nika zî hûmara 50. ya kovara Vateyî vejîya. Sey her hûmare muhtewaya na hûmare zî bi roportaj, nuşte, şiîr û sewbîna pirr o.

Hûmara 50. ya kovara Vateyî de bi serredaktoranê kovare Munzur Çemî reyde roportajêk ameyo viraştiş. Reyna na hûmare de derheqê kovare de fikrê nuştox û wendoxan ameyo girewtiş û ca dîyayo nê fikran. Reyna derheqê nuşte û nuştoxanê Vateyî de nuşteyêk yê J.Îhsan Esparî zî na hûmare de ca gêno. Heto bîn ra na hûmare de derheqê mewlidê Ehmedê Xasê de beşê dîyinî yê nuşteyê M. Selîm Uzunî esto.

Guven Yeşîlî şaîrê namdarî Silo Qizî reyde roportajêk viraşto û no roportaj zî hûmara 50. ya kovara vateyî de ca gêno. Sewbîna zî meqaleyê Murad Canşad, Mehmud Nêşite, Newzad Valêrî û Huseyîn Karakaşî kovare de estê. Reyna Denîz Gunduz û Pinar Yildize zî bi şîiranê xo beşdarê na hûmare benê. B. Şîlane zî tekstê xo yê mîzehî na hûmare de ca gêna.

## 2017 do bibo azadîya Rayberî û Şengalî

ROJWAR KARAKOÇAN/ ŞENGAL - ANF







Şerwanê Yewîya Xoverdayîşê Şengalî (YBŞ) û Yewîya Cinîyê Şengalî (YJŞ) derheqê serra neweyî de qisey kerdî û vînayîşê xo ardî ziwan.

Şerwanan ra Şoreş Şengalî va 'her serra ke bi esîrîya Rayber Apoyî derbaz bena, seba ma serra şermî ya' û qiseykerdişê xo wina domna: "Esîrîya ma 17 serrî yo ke dewam kena û na esîrîya ma hemînan a. Ma mecbûr î ke na esîrî biqedênî û têkoşîno ortax ya şaranê Rojhelato Mîyanên awan bikerî. Cayê Raybere Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî mîyanê êzidîyan de cayêko zaf muhîm o. Eke Rayberî nêbîyêne, do netîceyê qirkerdişan hîna giranêr bibîyêne. Ez hêvî kena ke 2017 do bibo serra azadîya Rayberîye, Şengal û Rojhelato Mîyanên."

**MA DO QEBUL NÊKERÎ**

Şerwanan ra Roza Raperîne zî ard ziwan ke 'ganî ma xoverdayîşî hîra bikerî û Rayberîya xo azad bikerî' û wina dewam kerde: "Ma do destûr nêdî ke serra neweyî de esîrî dewam bikera. Ganî şarê ma rêxistin û têkoşînê xo gird bikero û heme kayan veng bivejo û bi no hawa azadîya Rayberîya xo qezenc bikero. Zerrîya şarê ma Rayberîye reyde ya û bi heskerdişêko gird girêdayeyê ci yî. Çimkî rojê tewr zehmetinan de na Rayberîye hetê şarî de bî. Seba ke serra 2017 biba serra azadîya Rayberîye, ganî ciwanî beşdarê YBŞyî bibî. Serra neweyî do biba serra azadîya Rayberîye û Şengalî."

**RAYBERO AZAD, ŞENGALO AZAD O**

Şoreş Fedakarî zî va 'tehemulê ma êdî esîrîya Rayberîye rê nêmendo' û qiseykerdişê xo wina domna: "Seba nêyî zî ma do heta peynî xoverdayîşê xo gird bikerî. Girewtişê vernîya fermanî de rolê Rayberîye xeylê gird o, cok ra şarê êzidî Rayberîye rê bi hawayêko gird girêdaye yo. Êzidîyî zanî ke Raybero azad yeno manaya Şengalo azad. Cok ra ma wazenî 2017 bibo azadîya Rayberî, Şengal û Kurdistanî."

## Cayo ke zilm sey ejderha yo: Minbic

ABDURRAHMAN GOK / MINBIC – DÎHABER

**Êdî her taxe, raste, cayê bazarî yê Minbicî bi qelabalixîya xo nê, manzarayê xirabebîyîşî, kutiş, înfaz û dardekerdişan reyde yeno vîrardiş. Minbic mîyanê 3-4 serran de kewt nê halî û azadkerdişê ci ra 4 aşmî ra dima êdî merdimî newe newe huyenî**



Ma bi deyîrê ke dej û kêfweşîya nê erdan anî ziwan ver bi Minbicî şonî. Kewtişê Minbicî de rîyê huyaye yê Ebu Leylayî vejîyeno vernîya ma. O Ebu Leyla ke vera zulmî de seba ke keynaya xo Leyla rê welatêko azade biverdo, bi hawayo qehremanî şer kerdêne… Ebu Leylayî seba keynaya xo vatêne: "Şîrîna mi, wexto ke ti pîl biba ez biba an nêba, ti do her tim pîyê xo reyde îftîxar bikera."

Ma şîyayîşê xo ra rojêk dima ra benî meymanê keyeyê Ebu Mihemedî. Ebu Mihemed dest bi vatişê hedîseyêk keno: "Seba kişîyayîşî lazim nêbîyêne ke yew sucê merdimî bibo. Bi nameyê Huseyîn Bîmşîyî de kesêk estbî û bi mehneya 'birayê xo rê sîleh temîn kerdo' ra cezaya mergî dîya nê kesî. Çeteyan seba înfazî rojanê şemeyan weçînayêne. Celadî wexto ke sereyê Bîmşîyî ronayêne qotî ser, Bîmşîyî bi israr sereyê xo qotî ser ra antêne. Tewr peynî celadî bi sîlehê xo ci kişt. Tabî ma heme zî ewja de bîy û çeteyan seba ke ma temaşe bikerî, çimanê ma ver de ci kişt. Wextê panayîşê guleyî de mi sereyê xo tada, la eke înan bidîyêne do mi zî bikiştêne."

Ebu Mihemedî dima ra qala yewna hedîseyî kerd: "Îbrahîmêk estbî, mudurê firina nanî bî. Çeteyan seba ke ci înfaz bikerî, ardbî rasteyî. Celadî 3 reyan hewl da ke gule pano sereyê ci, labelê sîleh nêteqa û tewr peynî celad hêrs bî û bi wesayît ser laşê Îbrahîmî ra derbaz bî. Laşê Îbrahîmî yê parçebîyaye zî nîşanê her kesî dayî."

Ebu Mihemed qiseykerdişê xo de qala zulmêko bîn yê çeteyan keno: "Seba ke nêweşîya zerrî mi reyde esta, ez heban xebetnena. Labelê seba ke darûyê mi teberê Minbicî ra ameyêne, ser darûyan de nameyê Heyva Sorî estbî. Mi tersan ver nameyê Heyva Sorî pak kerdêne û bi no hawa xo reyde çarnayêne."

**HER ÇÎ BEDILÎYAYO**

Dima ra cinîya Ebu Mihemedî qisey kena û qala zulmê çeteyan kena, la dayîke her çiqas ke erebî qisey kena zî hende hîsin vana ke merdim bi asanî ti ra fam keno. Dayîke wina vana: "Heme çîyê ke seba ma qedexe bî, seba cinîyanê DAIŞî serbest bî. Mesele makyaj û parfum seba ma qedexe bîy, la seba înan serbest bî. Cinîyan bi asanî nêşînayêne şêrî doktor. Wexto ke ma eşnawit ke HSD ver bi ma yeno, ma hewl da xo biresnî warê azadan. Seba ke taxa ma ya tewr peyên bî, çeteyan ma sey qalkan xebetna. Dima ra ma ver bi başûrî remayî la çeteyan ma tepişt û yew camîyê de kom kerd. Yew keso sîlehin zî bica kerdbî, eke ma biremayêne, ê kesî do ma bikiştêne. Ma heme zî mergî girewt xo çim û remayî. Wexto ke ma resayî waranê azadan, ma çarşafanê sîyayan xo ra vetî."




## Surijan rê teblîgat ame erşawitiş


Taxê sûrijan vila bîy bes nîyo na rey zî TOKÎ sûrijan rê teblîgat erşawite.TOKÎ teblîgat de vana 'ganî şima wextêko tewr kilm de keyeyan veng bikerî'. 4 taxê Sûrî de qedexeya ke 2ê kanûna 2015 de amebî îlankerdiş, hema zî domîyena.

TOKÎ taxanê Hasirli, Cemal Yilmaz, Fatîhpaşa û Savaş de bi kepçeyan keye û dikanan rijnenî. Badê şerê 103 rojan 25ê adare de 'îstîmlakkerdişo leze' ame îlankerdiş û 100 ra 82 cayanê Sûrî ame îstîmlakkerdiş.

Badê qerarê îstîmlakî TOKÎ hîna lez da rijnayîşî. Şarê ke taxanê Zîya Gokalp, Alîpaşa û Îskenderpaşayî de cuyenî teblîgatê 'keyeyê şima malê îstîmlakî yo, keyeyan bi hawayo leze veng bikerê' ame erşawitiş. Bi no hawa nika dora kamcîn taxe ya ti kes nêzano û şarê heme taxan nika paweyê dora rijnayîşê keye û dikananê xo yî. ***AMED - ŞÛJIN***

## 'Tena wa kerraya mezelê lajê mi bibo'





Kurdistan de hîkayeyê kesê ke serranê 90î de ameybî remnayîş û kiştiş, nêqedîyenî. Hîkayeyê Zeynel Kursepî zî înan ra yew o. Endamê Hîzbullahî wexto ke Zeynelî remnenî benê keyeyê Samî Karadenîzî ke hetê Parka Ataturkî de yo, dima ra zî benê dewa Zarova û dima ra Zeynel ra ti zanayîş nîno girewtiş.

Pîyê Zeynelî Îbrahîm Kursepî qala lajê xo kerd.

Kursepî qiseykerdişê xo de wina va: "Ez wazena şêra mezelê lajê xo ser, la kerrayêk mezelê lajê mi daxî çin o. Lajê mi hetê endamanê Hîzbullahî ra ame remnayîş. Serra 1994 de roja 24ê adare de lajê mi seba ke nêweş bî, saet 09.00 de şî nêweşxane. Wexto ke nêweşxane ra vejîyeno taxa Amedî ya Êlihî de wesayîtêk vindeno. 2 kesê ke wesayît ra vejîyenî vernîya lajê mi gênî û ci ra vanî 'ma polîs î'. Zeynelî dekenî wesayît û remnenî. Ma vera zextê dewlete de Farqîn ra koçê Êlihî kerd. Mi muracatê dozgerî û walîtî kerd, la heta nika çîyêk zî nêame kerdiş. Kesê ke 6 rojî lajê mi reyde eynî hucre de mendî, qala lajê mi kerdî û vatî 'çîyêkê lajê to çinêbî û sax bî.' Goreyê 3 kesê ke lajê mi reyde eynî hucre de mendî; Çimê lajê mi nizdîyê 11 aşman hucre de padaye mendî. Çend kesî bi fîdye serbest ameyî veradayîş. Ma va qey do lajê ma zî serbest bêro veradayîş la nêame veradayîş. Ma doza tazmînatî akerd la dewlete doze red kerd." ***ÊLIH - DÎHABER***

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
1 Çile Yekşem 2017

ROJEVA MEDYA Ararat Basın - Yayın Reklamcılık Adına
İmtiyaz Sahibi: Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü: Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3 Yenişehir-DİYARBAKIR

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı (ÇAP):
İstanbul: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. No:13/A Yüreğir / ADANA
Tel:0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail: rojevamedya@hotmail.com



# Li xwezayê warekî KOMUNAL



**Li çewlika Margarîta her tişt ji xwezayê peyda dibe û lê serdestiya zilaman, cudahiya di navbera ziman û nijadan de tune ye û jiyaneke hevpar tê avakirin**

Li çewlika Margarîta ya ku di 2013'yan de li taxa Helvacilar a Buldanê ya Denîzliyê bi hêza cewherî ya jinan hat avakirin, warekî ku serdestiya zilam, cudakariya di navbera ziman û nijadan de tune ye û lê jiyaneke xwezayî tê avakirin. Margarita Dimitrova di gulana 2013'an de pîşeya xwe ya bijîşkiyê berdide û li gorî mîmariya xwezayî ya Buldanê mala xwe ava dike.

Li çewlika Margarîtayê çar demsal çandiniya xwezayî tê kirin. Der barê jiyana xwezayî de Dimitrova diyar kir ku ew ji bo axê bîne rewşa ku dikare lê çandiniyê bike, 3 salan ked daye û anî ziman ku ew li çewlika xwe tovên xwezayî bi kar tîne û tu carî gubreya kîmweyî û dermanan bi kar nayne.

Dimitrova destnîşan kir ku li çewlika wê ajotin û kolandina axê qedexe ye û wiha got: "Axê tenê mirîşk dikolin. Ez mirîşkan hem ji bo zibil bidin hem jî axê tevlihev bikin bi kar tînim. Ji bo vê ez hefteyê carekê cihê mirîşkan diguherînim."

Dimitrova da zanîn ku ew ji bo çandiniya teqesê bi pêş bikeve hewl dide û anî ziman ku ew dixwaze bi xebata xwe xwezaya ku ji aliyê mirovan re têra xwe hatiye talankirin, baş bike û bi xwezayê re bibe yek.

**DENÎZLÎ - DÎHABER**



## 'Divê mirov vegerin warên xwe'

**HERÎ DAWÎ** Dimitrova da xuyakirin ku divê li cihanê hemû mirov vegerin warên xwe û gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Ez cîhaneke ku zilam lê serdest nîn in, sînor, ziman û nijad cuda nîn in, dixwazim. Ez bawer dikim ku cihekî bi vî rengî dê pêşiya kapîtalîzmê jî bigire."

# Bi berhevkirina çopê debara xwe dike




Li navenda Agiriyê, Mahmûd Taştan (32) di nav ariya konteynerên çopê de komirê berhev dike û bi firotina wê debara malbata xwe dike. Taştan bêyî guh bide sermayê heta derengiya şevê bi ereboka xwe ya destan tax bi tax û kolan bi kolan digere û anî ziman ku ew ji bo ku debara malbata xwe bike, vî karî dike.

Taştan da zanîn ku ew dema dibe tarî û her kes ji karê xwe vedigere mala xwe, dadikeve kolanan û wiha got: "Ew çopên ku dilê wan jê dixele, dergehê nanê min e. Ez bi saya berhevkirina çopan derbara malbata xwe dikim."

Taştan destnîşan kir ku ew di nav ariyê li kêleka konteyniran tê rijandin de parçeyên komirê yên nehatine şewitandin kom dike û ev tişt anî ziman: "Ev komirên ku ez berhev dikim hinek ji wan ji bo şewitandinê dibim malê û hinek jî li çarşiyê difiroşim." Her wiha Taştan diyar kir ku ji ber ku ew berasteng e kes wî nagire kar û wiha bi dawî kir: "Ez ji berhevkirina çopê şerm nakim." **AGIRÎ - DÎHABER**

# Ji bo çîtayan alarma sor



Pisporan ji bo çîtayên ku li ser cîhanê heywanên herî lezgîn ên bejahiyê ne, hişyariyên girîng dan û diyar kir ku ji bo parastina nifşên çîtayan divê demildest bikevin nav hewldanan. Zanyaran aşkera kir ku çîtayên ku xwedî jiyaneke wehşî ne, li ser rûyê erdê tenê 7 hezar û 100 mane. Tê gotin ku çîtayên ku bi taybetî li welatên Asyayê dijîn ji ber zirar dîtina populasyonên wan li Îranê tenê 50 heb mane. Ji aliyê din ve li Zîmbabveyê ku yek ji welatên Afrîkayê ye, di nav 10 salan de hejmara çîtayan ji sedî 85 kêm bûye. Ji ber kêmbûna nifşên çîtayan ev rewş di raporên Yekitiya Parastina Xwezayî ya Navneteweyî de bû sedem ku rewşa çîtayan ji asta 'bêparastin'ê derkeve asta 'tunebûna nifşan.' Çîta yek ji heywanên dirinde ye û ji bo jiyanê pêdiviya wan bi qadên fireh heye. **AMED**

# Keşîşxane kirin axur!

BÎLAL GULDEM / ÊLIH - DÎHABER

Li Gundê Dêra Qîrê yê girêdayî Bişêriya Êlihê, Keşîşxaneya Mor Kîryakûs a xwe dispêrê sedsala 4'emîn û wekî navendeke olî ya girîng dihat bikaranîn, ji ber xemsariyê xira bûye. Keşîşxaneya ku li berwara rojhilata deşta Mezopotamyayê ya çiyayê Kirayê dikeve, 80 sal berê misilman li gund tên bicihkirin û piştî koçkirina malbatên suryan û ermenî yên dawî, terkî çarenûsa xwe hatiye kirin.

Li gundê bi dehan sal berê, gelek mirovên xwedî baweriyên cuda bi hev re dijiyan, li cem keşîşxaneyê mizgeft jî hebû. Li gundê ku ezan û naqosê bi hev re deng vedida, di navbera baweriyan de xweşbîniyek hebû lê ev xweşbînî bi polîtîkayên dewleta tirk hat tarûmarkirin.

Keşîşxaneya dîrokî di nav avahiyên tescîlkirî yên Midûriyeta Çand û Turîzmê ya Êlihê de cih digire. Li keşîşxaneya ku gelek deverên wê rûxiyaye, gelek odeyên bi hev ve jî nîşan dide ku wek kulliye jî hatiye bikaranîn. Li gorî çavkaniyan mirovên olî yên li vê kulliyeyê hatine perwerdekirin û bernaviya keşîşiyê wergirtiye, wek perwedekar ew dişandin dêrên li herêma Tor Abîdînê. Lê niha ev keşîşxaneya dîrokî ji ber xemsariya rayaderan ji aliyê gundiyan ve wek axur tê bikaranîn.



Sersala we Pîroz be

*Her serra neweyî seba şar û komelî hêvîyê neweyan xo reyde ana û zerrîya şar û komelî de heskerdişê neweyan awan kena. Serra 2016 her çiqas ke seba şarê kurdî dejanê giranan reyde derbaz bîye zî, hetê resnayîşê waştiş û xeyalê şarê kurdî de gamanê girdan da eştiş û şarê kurdî nizdîyê azadîye zî kerde. Ma hêvî kenî ke serra 2017 do seba şarê kurdî û heme şaranê bînan aştî û azadî bîyaro.*
*Na çarçewa de ma vanî*
*SERRNEWEYÊ ŞIMA PÎROZ BO…*

*Her gel û civak bi çand û huner, wêje û ziman, nasname û statuya xwe heye. Gelê kurd jî bi salan e ji bo çand û hunera xwe, wêje û zimanê xwe, nasname û statuya xwe tê dikoşe. Ev têkoşîn û berxwedana gelê kurd li çar aliyên Kurdistanê gihaştiye asta herî jor a serkeftinê. Me sala 2016'an li dû xwe hişt û em derbasî sala 2017'an dibin. Bi hêviya ev sal bibe sala serkeftin û azadiyê em sersala gelê xwe pîroz dikin...*

ODEYA ENDEZYARÊN MADENÊ - ŞAXA AMEDÊ